



Danerê Rojnameya Kurdi a pêşî  
Miqdad Mithed Bedirxan

# Armanc

Rojnameya Mehane

Hejmar, No: 131  
Îlon  
September 1992  
Buha - Price  
15 SKR, 3DM

**Piştî kuştina Dr. A. Qasimlo, Cumhuriyeta İslami  
Sekreterê Giştî yê PDK-İ Dr. S. Şerefkendî jî kuşt**

## Rejîma İslamî dîsa destê xwe di xwîna Kurdan gerand




Sekreterê Giştî yê PDK-İ Dr. Sadiq Şerefkendî

◻ Seva 17'ê Îlonê li Berlinê Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana İranê Dr. Sadiq Şerefkendî û endamê Komîta Merkezi û berpirsiyarê Ewrûpa Fettah Abdulî, berpirsiyarê Almanya Homayun Ardalan û welatparêzekî bi navê Nûrî Dehkurdî ji alî sê kesen çekdar ve di aşxaneyekê de hatin gulebarankirin.

◻ Ev êrişa xwînxwar ji alî gelek dewlet, siyasetmedar û mirovperweran ve hat protestokirin. Kurdan ev êrişa hov bi tundî rijimandin.

Şeva 17'ê Îlonê li Berlinê, li taxa Wilmersdorf, li resturanteke Grékî, "Mykonos", Sekreterê Giştî yê PDK-İ û hevalen wî bûn armanca êrişike hov. Sê kesen çekdar seet 11'ê şevê têr resturantê. Yek demanje di dest li ber derî disekine, duduynî din dikevin nav resturantê, derbasî oda ku berpirsiyarê PDK-İ û hin berpirsiyarê hêzên muxalif yên İranî lê ne, dibin û bi tivingên otomatik wan gulebaran dikan. Di êrişike de Sekreterê Giştî yê PDK-İ Dr. Sadiq (Dr. Seid) Şerefkendî, endamê Komîta Merkezi û berpirsiyarê Ewrûpa Fettah



Endamê Komîta Merkezi û berpirsiyarê PDK-İ yê Ewrûpa  
Fettah Abdulî

Dr. Sadiq Şerefkendî 2-3 hefta berî bûyerê derketibû Ewrûpayê. Berî ku ji bo civîna Enternasyonala Sosyalist here Berlinê, çûbû Fransa, Swêd û Danîmarkayê. Di gera xwe ya Swêdê de teví Fettah Abdulî, bûbûn mîvanê rojnama Armancê ji. Dr. Sadiq piştî civîna Enternasyonala Sosyalist, şeşa bûyerê ji bo ku bi çend berpirsiyarê hêzên muxelefeta rejîma İslamî re nanekî bixwin, diçin wê restaurantê.

Polisê Alman heta nuha di der heqê qatilan de tu agahdayike tekûz nedaye.

Wek wê xweş bê bîra xwendevanê me, berî 3 salan, roja 13'ê Tîrmeha 1989'an li Wiyanayê Sekreterê Giştî yê berî Dr. Sadiq, Dr. Abdurehman Qasimlo û berpirsiyarê Ewrûpa yê wê demê Abdulah Qadîri û ronakbirekî Kurd Fadil Resûl jî bûbûn hedefa êrîşek bi vî rengî û ew her sê jî şehîd bûbûn. Dr. Qasimlo jî wek Dr. Sadiq Şerefkendî li Stockholmê beşdarî kongra Enternasyonala Sosyalist bûbû û piştî kongrê çûbû Wiyana û li wir hatibû kuştin.

Dûmahîk r. 11

## Kurtejiyana Dr. Şerefkendî

Dr. Şerefkendî di meha Çileya Paşin sala 1938'an de li bajarê Bokan hate cihanê. Piştî xwendina destpêki û ya navîn li Bokan û li Mahabadê, di 1959'an de li Uniwersiteya Tehranê beşa kîmyayê xelas kir. Heta 1965'an li bajarên Urmiyê û Mahabadê li liseyan (Bekelorya) mamosteyîya kîmyayê kir.

Di 1965'an de ji ber sempatiya xwe ji bo têkoşîna netewî û PDK'ê ji alî hukumeta İranê ve hate surgûn-

Dûmahîk r. 11

Meznûn, Mehkûm û dozdarê Dewleta Tirk

## Musa Anter hat kuştin



Welaþperwerê Kurd Musa Anter

Rûreş kirin. Oktay Ekşî ci di hevpeyvîna xwe ya bi BBC're, ci jî di quncikê xwe yê di rojnama Hurriyetê de got ku; "li herêma Başûrêrojhîlat kontrgerilla cinayetan dike û kuştina Musa Anter jî ji alyî vê hêzê ve hatiye kirin. Ku wiha nebe, wê gavê pêwîst e dewlet qatîlîn wî derxe ortê."

Li Kurdistanê xelkê ji ber kuştina Musa Anter nerazîbûna xwe nîşan da. Ü bi tevgerên cûrbecûr bûyer protesto kir. Li Bismîlê, Îdilê, Nisêbînê, Dêrikê, Pasarû li Qiziltepê û gelek bajaren din esnafan dikanen xwe rojekê girtin û şofêran jî erebên xwe nedan kar.

Dûmahîk r. 11

Kuştina lawên hêja yê gelê Kurd  
**Dr. Sadiq Şerefkendî**

Fettah Abdulî  
Nûrî Dehkurdî  
û

## Musa Anter

divê bibe sebeb ku em ala doza bi heq a gelê Kurd bilinditir bikin.

Bila gelê Kurd sax be!  
**ARMANC**

## Sansurkirina xwe bi xwe

rûpel: 3

## Di perspektîva Kurd û Kurdistani de rastiyênu ku divê bêñ dîtin

rûpel: 4

## Hukûmet bi xwe ûnqilabeka eskerî teşwîq dike

Piştî kavilkirina Şîrnexê û gurrbûna êrişen dirindane yên ordiya Tirk, çapemeniya Tirkîyê dîsa dest bi munaqeşa wê yekê kir, ku gelo hin dixwazin careka din li Tirkîyê ûnqilabeka eskerî bikin, parlamento û hukûmetê ji meydânê rakin û diktatoriyaka eskerî bînin bikin bela serê Tirkîyê. Gava meriv guhdari û çavderiya vê munaqeşa çapemeniya Tirk dike ji her aliyê ve durûti û sextekariyek gemar jê dibare.

Gava meriv li munaqeşen niviskar û rojnamevânen Tirk dinêre û guhdariya beyanên siyasetmeda-reñ wan dike, dixwazin bidin xwiyakirin ku xwedêgiravî, partiyen siyasi yên Trk, parlamento û ji hemûyan bêtir ji hukumeta lubaskin a iro, li diji inqilabek eskerî ne, muhawele dikin ku riye liber wê bigrin û hwd. Demirel radibe di beyanên xwe de dibêje ku "Ma hûn demokrasiyê bixinin, hûnê ci têxin şûna wê."

Gelo rast e ku Demirel û hukûmeta wî û yên mayîn xwedi li demokrasiyê dertê? Demokrasiya ku ew xwedi lê dertê ci demokrasî ye, heta ku demokrasiye?

Erê rast e ku Silêman Demirel û yên wek wî, bi den-gan hatine hilbijartin û ketine parlamentooyê, di vê riye re gelek caran bûne serokwezir û hukûmet û heta nuha ji du caran ji ali eskeran ve bi darê zorê hatine daxistin, lê ev nayê wê manê ku ew demokrasihiz in, û xwedi li demokrasiyê dertê. Bileks gava meriv li rewş û rîveçûna Demirel û hukûmeta wî dinêre merî dibîne ku berî her kesî ew, sextekari û ixanetê li demokrasiyê dikin ji dêvla ku hesab û kitêb ji generalen serihidayi bikin, ordiyê di bin emir û kontrola parlamento û hukûmeta sivil de têxin rept û zebtê, bi vacayî hevsarê idarekirina welêt dixin nav lepen generalen militaris, ji xeyni êriş û terora dezgehêneşkeri yên diyar, rî li ber terora kontr-gerillarye vedikin. Cinayetên wan vedişerîn, ew bi beyanên xwe xwedi li karêñ wan ên qirêj dertê. Yen herî hov û dirindane kî ne rutbe, nîşan û xalatan bi wan ve dikin. Generalen darbe kirin hesab ji wan nehat pirsin, li gundêñ Kurdistanê ewqas pêşde çûn ku pîsiya însen bi gundiyan dan xwarin, hesab ji wan nehat pirsin. Li ser riya navbera Qulp û Licê meşvanen sivil gulebaran kirin, di Newroza çûyi de, êriş birin ser ahengen Newrozê, ser însanen bêsûc û bêguneh hesab ji wan nehat pirsin. Şîrnex, bajareki bi 20 hezar kesi di sê rojan de kavilkirin û xelk ber bi çolê de aware kirin kesî hesab ji wan nepirsî. Kontr-gerilla, ci bi navê xwe be, ci ji bi navê Hizbul-lahê be, her rojê bi dehan kesê bêguneh dikuje, ev canî nayen ifşakirin û cezakirin. Bileks hukûmet van karêñ hov ên ku li ber çavê hemû cihanê têñ ki-rin, îñkar dike, vedişere û dixwaze şeriyet û heqiyetê bide vi kari. Parlamentoya Tirkîyê û partiyen Tirkan ji cepikan ji wan re lê didin. Ronakbirêñ Tirk ên xwedêgiravî demokrat, methê wan dikin yan ji ma-zeretan ji cinayetên wan re dibînin?

Serekî nediti yên dirindane, li Kurdistanê dimeşe. Maf û azadiyên siyasi û demokrasî ji xwe bîhna wan ji ji Kurdistanê nayê, lê mafê jiyana însanan ji lê nemaye û yê ev rewş peyda kiriye, dewlet e, ordi û polisên wê ne. Her mesûlekî eskerî yan sivil ê Kurdistanê bûye zordareki wusa ku ci bixwaze dike û ev, wek rewşeka tebii tê qebûlkirin.

Ma li welitekî wiha, ku heq, huqûq, edalet û însaniyet lê nemabe, esker û polisên wan di hovîtiya xwe de bêhed û bê pîvan bin, û siyasetmedar û nivîskar û ronakbirêñ wî welatî ji cepika ji wan re lê bidin, meriv dikare behsa kîjan demokrasiyê bike ku general jê hez nekin û rabin ûnqilabekê li serê wê çekin.

îro li Tirkîyê esker ne muhtacî ûnqilabekê ne, loma ji ûnqilab çê nabe. Lê yên ku gazi ûnqilabekê dikin yan ji eskerî teşwîqi vê yekê dikin hene. Beri hemûyan ji hukûmet û parlamentoya îro bi xwe ne.

Hêzên Kurd yekîtiyên siyasi pêk tînin, konferans û kongrêñ xwe dicivînin;

## Hevgirtin-PDK hat damezrandin

Piştî xebata demekê Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkîyê, Platforma Yekîtiya Ala Rizgarî, Platforma Yekîtiya Netewî ya Kurdistanê, Muxalefeta Rizgarî û kadirêñ serbixwe bi hev re kongreyeke müşterek pêk anîn û Hevgirtin-PDK ava kirin.

Li aliyê din her du baskêñ KUK'ê yên mayî teví hin kadirêñ xwe yên kevin di xebata pêkanîna yekîtiya KUK'ê de ne. Kawa konferansa xwe, TKSP ji kongra xwe dicivîne.

Wusa xuya ye ku sala 1992'an wê bibe sala nuhvejîna tevgera Kurdistanê Bakur. Hêzên Kurdistanê Bakur piştî têkçûna 1980'yi vir ve her perçê bûn û belav bûn. Lî isal bû sala bi ser xwe ve hatinê; li hev dicivin, yekîtiya çedîkin, konferans û kongrêñ xwe dicivînin.

Îsal wek wê xwendevanê me ji bas bizanibin gava pêşî bi çêbûna YEKBÛN'ê re hat avêtin; PPKK (Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan), KUK-SE (Rizgarî-xwazêñ Netewî yên Kurdistan-Baskê Sosyalist) û KAK (Komela Azadiya Kurdistan) di meha Heziranê de kongreyeke müşterek

pêk anîn; Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê ava kirin.

Vê mehê ji gava duduyan hat avêtin. Piştî xebata çend mehan Partiya Demokrat a Kurdistanê, Platforma Yekîtiya Ala Rizgarî, Platforma Yekîtiya Netewî ya Kurdistanê, Muxalefeta Rizgarî û kadirêñ serbixwe bi hev re kongreyeke müşterek pêk anîn û Partiya Demokrat a Kurdistanê (Hevgirtin-PDK) hate damezrandin. Li gor malûmaten besdarêñ kongrê hinek ji Partiya Demokrat a Kurdistanê ne bi vê yekîtiyê re ne. Kongrê program û destûreke nuh qebûl kir.

Di programê de karaktera Hevgirtin-PDK'ê bi xetêñ giştî wisa tê ifade kirin: Hevgirtin-PDK, partiyekê welatparêz, demokratik û kitlewî ye. Ji hemû sosyalist, welatparêz, demokratîn Kurdistanê re vekiriye. Rast e rast ne dewama tu rîexistinan e, xwediya mîrata rîexistinê ku ji salêñ 1965'an û vir ve hatine damezrandinê ye.

Armancen siyasi yên Hevgirtin-PDK'ê ji ev in; Hevgirtin PDK ji bona ku dagirkirina kolonyalist li Kurdistanê bi dawî bê, sistema tade û kedxwirîye bê guhertin; ji bo ku mîletê Kurd qedera xwe bi destê xwe tayin bike û li Kurdistanê civakeke pluralist, demokratik û hevdemî ava bibe, têkoşînê dide.

Li aliyê din her du baskêñ KUK'ê yên mayî bi hin kadirêñ xwe yên kevin re di xebata pêkanîna yekîtiya KUK'ê de ne. Kawa karê pêkanîna konferansa xwe dike, PSKT ji piştî konferansa xwe ya derveyî welat, nuha ji kongra xwe ya giştî dicivîne.

## Ji YEKBÛN'ê Gaziye

Piştî kongra yekîtiyê, YEKBÛN'ê civîna yekem ya Komîta Merkezi çekir û li ser bîryarêñ ku di civîna KM'de hatine girtin belavokek belav kir. Di belavokê de bi firehî li ser torora dewletê û qetliamên Kontr-Gerilla û Hizballah tê sekinin. Û tê gotin ku dewleta kolonyalist, bi ci hawî dibe bila bibe dixwaze têkoşîna gelê me ya ji bo rîzgariyê bîfetisine. Û hemû partiyen li parlamento temsîl dîbin(beyî HEP'ê) di vî warî

de bi Konseya Mili ya Ewlekarî re di gihijin hev û di yek bir û baweriye de ne.


Li aliyê din YEKBÛN, li hember êriş û terora dewletê ji PKK, PDK, PSKT, KUK û Rizgariyê bigre gazi hemû hêzên sosyalist, şoreşger û welatperwer dike ku gelşen xwe bi riye dostaniya siyasi û têkoşîna ideolojik çareser bikin û hêzên xwe bigîhîn hev û rî li xebatên hevkîriye vekin.

## Rojnama Resmî ya Hukûmeta Kurdistanê

Hejmara 1. a rojnama resmî ya Hukume-ta Kurdistanâ Iraqê bi navê "Encumen" di 15/9/1992'an de derket.

Ev hejmara Encumenê 30 rûpel e, 9 rûpelên wê bi Erebî, 21 rûpelên wê ji bi Kurdi (Soranî) ne. Ebada wê 30x23 cm ye.

Têde bîryar û qanûnên ku ji teref Hukûme-ta Kurdistanâ Iraqê hatine girtin cih digrin.



### Armanç

Rojnama Kurdi ya mehane  
Monthly Kurdish Magazine

#### Redaksiyon:

M. Eli  
Zinarê Xamo  
Hesen Mizgin  
Mîrza Bextiyar  
Lewend Fîrat  
S. Rêving  
M. Lewendî  
**Redaktorê berpirsyar:**  
M. Eli  
**Berpirsyarê beşê**  
**Dimîkî:** Malmisanij

Adres :

Box: 152 16  
161 15 Bromma  
Sweden

Telefon

46-8-803135

Telefax:

46-8-801825

#### Ansvarigutgivare:

Kurdiska  
Demokratiska  
Arbetar Unionen  
Postgiro: 50 37 99-9  
ISSN: 0348 7385

#### Abonetî

#### Prenumeration

Abonetiya Salekê  
Li Skandinaviya

150 SKR

Maqam

Myndigheter

250 SKR

Li Ewrûpa

50 DM

Li derveyî Ewrûpa

40 \$

Anons/filan

nîv rûpel/ en halvsidan

2500 SKR

Kongra HEP'ê ya duyem çêbû

## Ahmet Turk bû serok

**Ev kongre jî wek kongra çûyi li ser rewşa welat û politika ku divê iro bê meşandin ranewestiya, ji bo PKK'ê û serokê wê Abdullah Ocalan gelek tezahurat hattin kirin. Ahmet Turk ji rayên 504 nûne-ran 94 ray girtin û bû serokê HEP'ê.**

Roja 19'ê Îlonê li Anqerê kongra HEP'ê (Partiya Ked a Gel) ya duyemin a îstîsnayî çêbû. Ji 504 nûnerên kongrê bes li dor 300 kesî besdar bûn.

Kongrê bi axaftina serokê HEP'ê Feridun Yazar dest pê kir. Yazar di axaftina xwe de bi giranî li ser têkiliyên HEP û PKK'ê rawestiya û got: "Tu têkiliyên HEP'ê yên organik bi PKK'ê re tunene. Lî em xizmîn hev in. Li wê herêmê kesen ku siyasetê dîkin hemû xizmîn hev in; DYP ji, SHP ji, ANAP ji". Li ser çareserkirina mesela Kurd li Tirkîyê, Yazar weha got: "Bi riyên eskerî mirov nagîhîje tu derî. Heger hûn ditirsin PKK'ê legal



bikin; bila dest ji çekêن xwe berdin, werin têkoşîna siyasi bikin".

Dûre parlamenterê Şîrnexê Mahmut Alinak peyivî. Wî di axıftina xwe de li Serokwezîr Demirel, Serokê Erkanî Herb Dogan Gureş rexne girt, kîrinê kontrgerîla yê li Kurdistanê protesto kir. Her wisa gazî dê û bavan kir ku ew zarokê xwe neşînîn eskeriyê; "lawêne xwe neşînîn mirinê; wek esker neşînîn Başûrê Rojhîlat". Wî di dawîya axaftina xwe de ji got; "dema pirs

hel bibe, wê şîdet jî nemîne".

Berî kongrê Feridun Yazar û Mahmut Alinak namzediya xwe ya serokatiye paş ve girtin. Ahmet Turk tenê wek namzet xwe pêşkêş kir. Lî tiştê herî balkêş ew bû ku Ahmet Turk ji 504 nûneran tenê 94 deng girtin.

Ev kongre jî wek kongra yekem li ser rewşa welat û politika ku divê iro bê meşandin ranewestiya, di leyha PKK'ê û serokê wê, A. Ocalan de gelek tezahurat hattin kirin û slogan hatin avêtin.

## Êrişen PKK'ê zêde dibin

Şerê di navbera PKK'ê û dewletê de her ku diçe gurr dibe. Gava rojnama me di çapê de bû xebera şerekî mezîn hat. Li gor xeberîn ajansan 29'ê Îlonê bi şev hêzeke PKK'ê li dora 500-600 kesî li herêma Şemdinliyê dire ser qereqola Derecîk a ser sînor. Şer 12 seetan dajo. Helikopter û balafirêne Tirk ji tevi ser dibin.

Li gor beyana Serokwezîr Tirkîyê Suleyman Demirel, ew bi hazırlûne û PKK xistine kemînê û bi kîmasî 174 kes ji wan kuştine.

Zayıata dewletê jî bes 29 kes bûne.

Lê li alî din mesûlekî PKK'ê li Almanya ev iddiyâyen Demirel û hukûmeta Tirkîyê tekzîb kir û got dewlet bi zanîn kuştiyên xwe hindik û yên me pirr nişan dide. Got wan 300 esker kuştine û gelek jî birîndar kirine. Û zayıatê wan jî bes 13 kes in.

Ji ber ku rojnama me li ber derketinê bû me îmkan nedît ku em bi teferûat li ser vê bûyerê rawestin.

Xirvatistanê piştgiri-ya me ji Kurdistaneke serbixe û azad re didim nişan..." Nûnerê Partiya Sosyal-Liberal ji weha got: "Rewşa Kurden belengaz û şerî li dij wan ji bo cihan û bajarvaniya û şermeke mezîn e... Em ji bo Kurd û Kurdistan piştgiriya xwe a bêşînor diyar dîkin..." Doçent Mirko Stifanic, serokê Dezgeha Zanîsi a Sosyolojiye û gotina xwe de xuya kir, ku: "...mafî şarenîsiye mafekî pîroz e, ew mafî hemû gelan e. Gelê Kurd ji vî mafî xwe bêpar maye. Têkoşîna wî ji bo bidestxistina vê helbet pîroz e. İro li cihanê 190 welat hene, hêvidar im ku wê Kurdistan bibe endama 191 ê a Koma Miletan..."

Hêjayî gotinê ye, ku çapemeniya Xirvatî ci da vê bûyerê.

Kamiran Hacabdo

ol, erdîngarî û rewşa niha ya Kurdistanê gotar hatin xwendin.

Mêvanîn civînê, berpirsiyareñ rîexistinê Xirvatî piştgiriya xwe ji têkoşîna gelê Kurd re nişan dan. Di axaftinê xwe de, şerî hovane yê li dijî gelê me protesto kirin, ji bo Kurdistanê azad û serbixe piştgiriya xwe nişan dan. Serokê Partiya Demokrat a Xirvatistanê de axaftina xwe de wiha got: "Kareñ hovane ku dijmin, li seranseri Kurdistanê dike, kareñ li dij mirovatiyê ne... Ez bi navê Komara Xirvatistanê û Partiya Demokrat a

## Li Xirvatistanê civînek bo danasîna Kurdistanê

Di roja 27. 08. 1992'an de Civata Xwendekanê Kurdistanê li bajarê Rijeka, yê Xirvatistanê civînek agahdariyê li ser Kurd û Kurdistanê çekir. Armanca civînê ev bû; naşandina gelê Kurd û welatê wî bi gelên vî welati (Xirvatistanê) û ji bona gelê Kurd û tevgernî wî adil wergirtina piştgiriya hêzîn demokrat, pêşvînî û aşixwaz.

Di civînê de, ji bîli kesen Kurd, rojnamen, nûner û berpirsiyareñ rîexistin û partîyen Xirvatî jî besdar bûn.

Di civînê de bi firehî li ser dirok, ziman,

**NEYNIK**

## Sansurkirina xwe bi xwe

**Serdar Dicle**

Li welatênu ku demokrasi baş lê bi cih nebûye, azad fikirandin û bi azadî ifadekirina nêrinê xwe nabe perçak ji kareterê mirov. Welatênu waha ji alî aborî ve bi şunde mane. Ne zanebûna gel, ne rewşa siyasi û civakî û ne ji faktörên din rî didin ku norm û pivanen modern derkevin pêş. Her welatêku weha xwedî ideoolojiye resmî ye û xwe bi qanûnen ne demokratik diparêze. Li Tirkîyê navê wê **Kemalîzm** e. Li Sûriyê **Baasîzm** e û li welatê sosyalist ji Marksîzm-Lenînîzm bû... Li welatênu wuha mirov ji mafîn axaftin û nîvisandin bêpar e. Di qanûnen weşan û cezayê de tê xuyakirin ka ci dikare bê axaftin û nîvisandin û axaftin-nîvisandin ci qedexe ye. Kesen di-xwazin van civatê anti-demokratik biguherînin, mecbûr dimîrin xwe kontrol bikin, sînoran ji xwe re deynin.

Bê texsîrkirina gotina xwe, vekirî axaftin û nîvisandin bi risk e. Girtin, lêdan û kuştinê bi xwe re tîne. Dibe ku mirov ji civatê bi dûr keve, bê heval û dost, tenî bimîne. Bêkar û birî bimîne, ji mekteban bê qewirandin... Bi kurtayî cihanê li mirov tarî dikin.

Di her civatênu wuha de kesen wek î. Beşîkçi û Mandelâ ku bi ci bawer bin, wê dibêjin-dînîvisinîn, heger ne tenê yek-dudu bin jî lê hejmara wan tim ji tiliyên destekî derbas nabîn. Bi her gava ku davêjin, dizanîn ka ci li pêş wan e. Lema bi deh salan jiyan girtigehan û zulmîn din wan zêde naesine. Lihevkirina raman û kirinê, wicdan û mîjîyê wan rehet dike. Bar li wan sivik dibe.

Piraniyâ mirovan ne weke wan in. Xwe diparêzin. Bêyî ku jiyanê li xwe bikin jahr. Li rî û metodên din degerin. Di axaftin û nîvisen xwe de ji gotinê túj û vekirî direvin. Kesen guhertineke radikal xistbin rojeva xwe dest bi derxistina rojname û kovarén nehirî (illegal) dîkin. Partî û rîexistinê dîzî tên avakirin... Bi her hawî çûyîna cem xelkê ne bi dileki "paqîj", lê bi hesab û kitêb e. Ji bo ku hesabê malê û yê bajîr li hev derkeve têkiliyên matematikî tên danîn. Südêne rîexistinî û şexsî kilitê li ziman dixe; tiştê difikire nake. Lî yên civat jê bi hêviye dike. Denge tê hesabkirin, di nîvisen xwe de divê dilî hin der û kesan ji xwe nehêle. Di meha Remezanê de dixwaze çayekê li qahwê vexwe, nikare. Xelkê dilî xwe jê bigre. Gava bi hevaledîk xwe re bixwaze li derekê rûnê bîrayeke sar vexwe, wê bi tirs be. Ma der û dor wê ci bêje? Bi dizi dike. Baweriya wî bi dîn nayê, lê civatê mafî axaftinê jê stendiye. Ji bo ku şexsiyeta xwe ya rastî nişan nede, kîmasî û zeifiyên xwe veşere, wê di civatê de kêm bişeyive... Wek hêviyên civat jê dike jiyan para wî ketiye. Dewlet ne bes bû, civat jî dibe qembûrê ser zembûr. Bê talîhiya rewşenbir ew e ku ew bi misyonâ guhertina rejîmê, norm û pivanen civatê derdikeve ortê, lê ew bi xwe dibe "kolê" wan. Bi buhayê mirina xwe li dij sansura dewletê têkoşînê dide, lê dikeve bin sansura civatê û pêre ji a xwe.

Ku rewş ev be gava mirov bi kesen din re li derekê -komel, partî, rîexistin- gîhaş cem hev pêwist e xwedî nîrîn xwe be û wan bêje. Bi zaneti bêdengî pêlkirina şexsiyet û înkarkirina hebûna xwe ye. Li wê derê hebûna mirov bê rûmet dike. Hebûn û tunebûn tenê bi qandî leşkerekî "besit" dimine.

Di vir de, di nav qewsê de pêwist e bê gotin. Tê qebûlkirin ku mirov ne bi axaftinê xwe, lê bi kirinê xwe tê naskirin. Rast e, lê kêm e. Mirovên civatê paşdemayı bêtirî ne bi raman û daxwazên xwe lê bi ên dewletê û civatê dijîn. Wê gavê çêtir e bê gotin: " Mirov bi tiştê difikire lê nabêje û nake jî tê naskirin". Şexsiyeta esasî di bin kûraniya mîjî da veşartî dimine.


Bê guman raberizîna ku "ji reaksiyonen cuda cuda kîjan rast e?" bê mane ye. Rastî tenê di hundurê yekê de neciviya ye. Hilbijartîn bi şexsiyeta mirov ve girêdayî ye. Kesen iddiâ dîkin ku sedî sed tenê reaksiyonek, aango ya wan rast e, bi talûke ne. Ev dogmatîzm e û gaveke jê wê de ji fanatizm e.

Mixabin ev çend salêne dawiyê hesasiyeta İsmail Beşîkçi li hember dewletê, xwe di têkiliyên partî û rîexistinê Kurdan de xuya nake. Wî ji renc û xebata wan a deh salan re çav û guhêne xwe girtine. Ne wek miroveki bi ilim mijûl dibe, lê wek siyestvanekî Rojhîlata Navîn helwestê digre. Veşartin û parastina tahrîbên hatine kirin û iro ji berdewam in wê tenê zirarê bigîhîne netewa Kurd.

"Karê ez dikim rast e, lê eynî karî yekî din bike çewt e". Kesî ji vî mîjîyê du standart xêr nedîye. Bi xwe nîviskareñ şoven ên Tirk wek Ugur Mumcu, Oktay Ekşî û hwd. tam di vê noqtê de Kurdan neheq dîkin. Rast e ku ew li dijî terora dewleta xwe disekekin û dipirsin ma cîma Kurd ji terora xwe re bêdeng dimîrin. Ne pêwist bû gava li İstanbul Bakirkoyê jîn û zaro-kên bêsûc hatin şewitandin, Kurda dengê xwe bilind bikiranâ ev bûter protesto bikiranâ? Karên wusa têkoşîna gelê Kurd bi Tîrkan ne rast dide naskirin, talûka şerî Tîr-Kurd zêde dike. Ü Kurda bi dewlet û gelên cihanê wek terorist dide naskirin. Bêdengbûna me Kurdan parastina kuştina jîn û zaro-kân e. Ev rastiya tal gelek caran mafî me yi sekînandina li hember terora dewleta Tîr ji dest me digre. Dewlet terorist, ma em ji terorist? Ci ferqa me dimine?

Bila neyê jîbîlkirin ku kes û rîexistinê bi xwe bawer li rexnan guhdar dîkin. Guhgirtina ji rexnan re qelsî ye, dijîn pê xurt dike. Rexne ne di cih de be, dem û jiyan dê wê neheq bike. Rast be şâşî û kîmasî wê serrast bibe. Qebûlkirina rexnan û rexnelixwegirtin wê kî biçûk bixe? Bêdengman şirîkatiya berdewamiya çewtiyan e. Wê gavê gelek car çav girtin ne dostanî ye. Li cihê vekirî bêdengbûn destpêka li paş hev peyivandinê û gotinê paş deriyan e...

Ma gelo ji iro de gavine divê bêne avêtin qet tune ne?



## RAMANÊN RAMANWERAN

# Di perspektîva Kurd û Kurdistanî de rastiyênu ku divê bêñ dîtin

**Dr. Sîrac Bîlgîn  
Hesen Mizgîn**

Bê şik kesê/a siyasi ji bo ku siyasetê bike, divê gelek tiştan bi awakî eşkere û zelal fêm bike, da ku bikaribe bîr û baweriyêne xwe bi awakî rehet bide fêmkirinê. Kesê/a siyasi ku di xet û babeta xwe de ne zelal be -û eger ev kes di iddia serokatiyê de be- tim û tim ketiye neçariyê. Di vê babetê de marjînalbûna rêxistinê ku ji sala 1970 û vir de derketine holê, ji bo serokên siyasi yên Kurd ku dibêjin wan ji rojênu buhurî ders stendine û ji xwe re xet tayin kirene pir bi qîmet e.

Emê bêyî ku pir dirêj bikin, derbasî pirsa xwe bibin; gelo tiştênu ku Kurdêni siyasi bi awakî eşkere fêm bikin ci ne? Di demen dawiyê de li holê sloganênu ku rojênu buhurî tûnin bîra mirov wek; "Em hatine guhertin", "Me serkaniya xeletiyênu xwe dit", "Me mejiyê xwe serbixwe kir" heya ku bi awakî bi bawerî neyêni nivîsandinê û ifadekirinê, wê rî ji xeletiyênu re vekin û dê nikaribin pêlén naveroaka xwe vala yên di jiyana siyasi ya Kurda de rawestinê û dê nikaribin alîkariya vemirindina agirê bêhîvityê bikin. Ji bo ku naveroka gotinê li jor tije be divê siyasiyê me berî her tiştî avahiya pluralist a civaka Kurd û "pergal (sistema) dinya nû" bi awakî rast fêm bikin û ji bo vê yekê ji ji xwe re programeke siyasi ya ji rastiyê ne dûr pêk binin. Divê program zelal û fesih be, ku karibe ji alî kesênu din ve xweş û bi reheti bête fêmkirinê. Programen eklektik û tevlîhev weke ku me li jor ji got; dê mejiyan tevlîhev bike û rî ji xeletiyênu re veke.

Balansa dinê bi hilwesandina YKSS (Yekîtiya Komarêni Sosyalist ên Sovyeti) hate guhertin. Valahiya ku derkete holê iro DYB (Dewletên Yekbûyi yên Amerîkayê) bi bikaranîna Konseye Ewlekarîya Netewêni Yekbûyi dixwaze tije bike û gelek caran ji di helkîrina hin pirsan de bi serê xwe çare dibîne. Ji bo doktrîna xwe ya ku bi navê "pergela dinya nû" bi nav dike, hêdî hêdî îzah ji tîne. Herçiqas DYB di vê doktrîna xwe de li hember xwe raqîben wek Almanya, Fransa û Brîtanîya Mezin dibîne ji reqabeta wan heya ciyekî ye û jê pê de bi hev re ne. Hedefa DYB, CEE (Civaka Ekonomî a Tîrîfîyât) û ya Japonyayê afirandîna istîqrareke navneteweyî, istîqrareke global e. Dewletên ku metodên wan qebûl nakin raste rast bi mudaxela leşkerî yan ji bi tedbîren din tînin rî. Diktatorên wek Saddam Husêni li hember dewletên sûper, tevî kesênu ku li pey wî diçin, serê xwe ditewînin. Dewletên şovenîst û nijadperest li hember daxwaza dewletên super, xetînu xwe yên siyasi roj bi roj di guherînin. Iro li dinê tu pirs tuncye ku bêyî daxwaz û hedefa DYB, Fransa, Almanya, Brîtanîya Mezin û Japonyayê bêtin helkiri-

nê. Li vir DYB xwedî giraniyeke giřing e.

Belê di vê noqtê de em dikarin li ser rastiyênu ku kadirêni politik û Kurdistanî divê bibînin, rawestin. Di riya helkirina pirsa gelê Kurd de divê girîngiya dinamîzma gelê Kurd bi xwe tu caran neyê jibirkirinê. Divê bête zanîn ku bêyî dinamîzma hundir xelasbûna gelekî ne mumkun e.

Civata Kurdistanî civateke heterojen e. Ji ber vê yekê ji di vê civatê de bîr û baweriyênu cûr be cûr çiqas normal be, avakirina parti û rêxistinê cûr be cûr ji hewqas normal û hewcedariyek e. Nabe ku mirov gelê Kurd têxe nav qalibekî yan ji wi mecbûr bike ku partiyekê tenê hilbijere, riyek wiha ne mantiqî ye û şaş e.

Eşkere ye ku li Kurdistanî kadirêni Marksist-Lenînist û dînî (oli) hene û xwe bi rî xistin. Li vir meqsedâ me ne kadirêni oli ku di bin siya mîtingehkar de ne û bi

**Civata Kurdistanî civateke heterojen e. Ji ber vê yekê ji di vê civatê de bîr û baweriyênu cûr be cûr çiqas normal be, avakirina parti û rêxistinê cûr be cûr ji hewqas normal û hewcedariyek e. Nabe ku mirov gelê Kurd têxe nav qalibekî yan ji wi mecbûr bike ku partiyekê tenê hilbijere, riyek wiha ne mantiqî ye û şaş e.**

navê "Hizbulâh" têne naskirin e. Ne xêr, meqsedâ me; li gor sînayînu ku digihîjin me, partiya İslâmî ya Kurdistanî ku bi perspektîfa Kurdistanî derketiye holêye. Lî belê partiyekê sosyal-liberal ku bi bawerîya me iro ji alî piranya rewşenbirênu Kurd ve tê qebûlkirin; pir mixabin hêj neketiye jiyana siyasi ya Kurdistanî. Bi bawerîya me partiyekê wisa dê valahiyek mezin tije bike. Partiyekê sosyal-liberal ji bo cemahîren Kurd dê hem üfqîn nû û hem ji bi perspektîfeke nû riya fêmkirina hevdema veke. Partiyekê sosyal-liberal dê imkana entegrasyona gelê Kurd bi dinya nû re firstan biafirine.

Di pêvajoya dinya nû de tiştîku bala mirov diksîne û xuya ye ku xwedî giraniyeke taybetî ye; li welatînu wek Kurdistanî partî çiqas bi hêz bin û têkoşînek çekdarî bimeşîn jî eger di bîr û raya gişî ya navnetewî de qebûl nebînin, şansê wan yê serkeftinê gelek biçûk e û hetta em dikarin bîbîjin ku bi ser nakevin. Bi ya me helkirina pirsa netewî ya gelê Kurd bi partiyen legal ku bi gel re bûne yekwucûd, bîr û bawerîya wan bi demokrasî û parlamentarizma pirdengî hene, mumkun e. Partiyen wiha divê ji alî kesênu ku xwe bi awakî rast û durust di-

din fêmkirinê, bêtin avakirinê.

Bi ya me kadirênu ku tesîren Marksizm û Lenînizmê ji serê xwe neavêtine û ev yek bi awakî cesûrane ifade nekirin, nikarin di avakirina partiyekê liberal de ciyê xwe bistîn. Kesênu ku di pirsa Marksizmê de ne zelal in û dixwazin di avakirina partiyekê sosyalist de ciyê xwe bistîn û partiyen wiha idare bikin, di tewrê xwe de ne samîmî ne û icraata wan tu feydeyê nadexebatê. Divê kadirênu me di tewr û icraata xwe de, di bîr û bawerîya xwe de samîmî û tabîn. Ev yek ji bo her cûr ideolojiyê derbas dibe. Divê di pêvajoya dinya nû de piyêni kadirênu me erdê bigrin û li gor wê ji tevgera xwe bidomin.

Zîhniyetênu ku xwe bi her awayî eşkere nekirin, li gel vê ji xwe nêzî rêxistinê xwedî tradişyoneke dîrokî bikin û di hewildana bi rêxistina wan rabin, di rojê dahatû û wê xirabiyeke mezin bidin têkoşîna gelê Kurd.

Li vir meqsedâ me ne ew e ku divê yekîtu çenebin. Yekîtiyek bi niyeta durust û samîmî ji eşkerekirina bîr û bawerîya mumkun e. Hêviya me ew e ku di xebat û karên yekîtiyê de zelalbûn û samîmîyet hebe. Bervajiya vê yekê bê şik wê zirarek mezin bide têkoşîna gelê Kurd.

Ku em bi kurtî bîbîjin; li Kurdistanî bi rêxistina her bîr û bawerîya siyasi ji bo welatîme dewlemendiyek e. Ji bo ku têkoşîna gelê Kurd bi serkeve divê xebat û têkoşînek legal bête organîzekirin. Taktîkîn illegalîzekirina têkoşîna gelê Kurd divê bêtin bertefrikirin. Divê kadirênu Kurd fêm bikin ku illegalîzm di têkoşîna gelê Kurd de heya iro kadirênu hêja berteref kirin û ji meydana têkoşînê dûr xistin.

Partî û rêxistinê ku di têkoşîna gelê Kurd de ciyê xwe standine, divê di programeke asgarî de hevkariyek qewî pêk bînin û wê têxîn jiyân. Partiyen me yên siyasi; sosyal-liberal, muhafazakar, sosyal demokrat, sosyalist, İslâmî û merkezî divê danûstendîn xwe bi partiyen navnetewî yên di xeta xwe de xurt bikin da ku meşrûiyeta pirsa gelê Kurd di meydana navnetewî de bidin qebûlkirin.

Divê perspektîfa Kurd û Kurdistanî ji alî hemû partî û rêxistinê Kurdistanî ve berî her tiştî bête parastin. Ji bo çareserkirina pirsa Kurdî, danûstendîn xwe bi partî û rêxistinê Turkiyê yên di xeta xwe de xurt bikin, da ku rî û fîkrîn pozîsif derkevin holê. Bi gotineke din; divê sosyalistên Kurd bi sosyalistên Tîrîfîyât, sosyal demokraten Kurd bi yên Tîrîfîyât, muhafazakarên Kurd bi yên Tîrîfîyât û hwd. re ji bo çareserkirina pirsa gelê Kurd diyalog û munâqşeyen xwe xurt bikin. Di vê babetê de nermbûn û dilxwaziya komprîmîsan pêwistiyek e.

Belê, bi ya me; bi bîr û bawerîya ku me pêşkêşî we kirin, dêriya vekirina munâqşeyen navnetewî li ser pirsa gelê Kurd hêsanfir be û qedera gelê Kurd bête guherînin.

Şevezê, nîvê şevê kerê dest bi zirrinê kir. Xewa hemû heywanen daristanê herim; giş ji xewa şîrîn şîyar bûn. Ji heywanan hinek qehirin, li kerê rabûn; gotin "lawo kero, huş be, te em ji guha kirin." Hinan cûn jê reca kirin, li ber geriyan, xwe avêtin bextê wî, ji bo ku nezire, daku heywan ji bikaribin çavênu xwe nerm bikin. Lî bê sebeb navê wî nekirine ker, ma qet disekine. Bi zorê carê zirrinê pê giriyete, heta biweste wê bizire.

Di wê qereperê de serê şér ji nav daran, xuya dibe. Şér bala xwe didê ku ker bêyî ku ji kesî perwa bike bi kîfa dilê xwe dizire û kesî ji bi tişteki nahesibîne.

Li ser vê bê perwatiya kerê, xwirinî û hîbe hîbek bi şér dikeve, hey hawar, erd û ezman dilerize, heywan giş xwe diqurnisîn ser hev...

Ker fahm dike ku fis ne oxir e, hema di cî de zirrinâ xwe dibire, guh wek şekalan dirêj dîbin; qerde qerde diçe xwe dide kîleka darekê...

Piştî ku dinya hinekî ji hev kês û fêş dibe, qantir hêdî hêdî, diçe ba kerê me yê henşeri, jê re dibêje: "Em hewqas li ber te geriyan, me ji te reca kir, tu nesekinî, de tu pir mîr û nuha bizire ha !!

Ker boçika xwe li ba dike, dibêje:

"Birako, erê ez ker im, lê hewqasî ji ne ker im."

Yanî her mîranî û ehmaqî ji netice sinorekî wê heye, derbaskirina vi sinori bîvik e.

Heger rejima Refsencanî ji wek kerê, ji "şêrekî" şayış bikira, ji "hin deran" bitirsiya, helbet wê nikaribûya piştî qettilkirina Dr. A. Qasimlo û du hevalen wî, îcar ji Dr. Sadiq Şerefkendî, Sekreterê PDK-î û sê welatperweren din li orta Ewrûpayê, li Berlînê bide gullebarankirin. Çimkî rejima mellan bala xwe dayê ku waye cînayetê wan ji wan re dimîn, ne kes tê girtin û ne ji ji ber van cînayetê wan kes wan mahkûm dike û dibêje Iran dewleteke terorist e.

Heger li dînyayê ji caran carekê ji ba wek şér li kerê rabû, "şêrek" li dewleta Tîrîfîyât rabûya, bigota "divê terora" ku hûn li hember Kurdan dimeşînin rawestînin" ya na emê we ji wek rejima Qedaffî rejimeke terorist ilan bikin, wê gavê helbet wê dewleta Tîrîfîyât nikaribûya li orta Diyarbekirê, welatperwerê mezin Mûsa Enter qetil bikira. Wê nikaribûya ji serê salê heta nuha bi metodên mafiyatê li Kurdistanê 220 kes bidana kuştin. Wê nikaribûya wiha bi reheti jîyan li gelê me heram bikira û Kurdistanî ji bikira Afrika Başûr.

Lî iro nayê hesabê tu dewletê, tu rêxistîneke navnetewî ku ji terora van rejimên destbixwîn re bi şiklekî ciddî bîbîjin STOP ! Lema ew ji him li der û him li hundur, gava dilê wan dixwaze têne teq, teq, teq me dikujin û vedigerin malên xwe.

Zirrinâ kerê ji ber ku heywanen din nerehet dikir şér reaksiyon nîşan da, got "heqê te tuneye tu xewê li xelkê bîherimîn; lê kuştina serokên Kurdan li dînyayê nabe sebebê reaksiyon û protestoyeke ciddî.

Gava menfeet tê hebe li dînyayê "şér" pirr in û giş ji doza heq, huqûq û edaletê dikin, lê gava dor tê ser me hemû dibin kevrosk...

## Civîna IPU

Yekîtiya Navnetewî ya Parlementoyen (IPU) di civîna xwe ya 88'emi de ji ber ku Tîrîfîyât mafê parlementerên Kurd nas nake û dixwaze masûniyeta (dokunulmazlik) wan ji destê wan bigre, ew protesto kir. Yekîtiya Parlementoyen Navnetewî civîna xwe ya 88'emi de navbera 4- 12 û 17'ê Nisanê de wê li Stockholmê çekir. Ji 102 welatên nêzî 500 parlementer di civînê de besdar bûn.

IPU'yê piştî civînê belavokek belav kir. Di belavokê de Tîrîfîyât bi 10 welatên din re ji ber terora li dijî parlementerên Kurd tê meşandin bi tundî tê mahkumkirin. Di belavokê de tê gotin ku Tîrîfîyât dixwaze masûniyeta parla-

menterên Kurd rake, wan her roj bi kuştinê tehdît dike. Bi vê riyê ji çavê wan ditirsinê, rî li ber xebata wan digre.

Ji bo baştir tetkikkirina rewşa parlementerên Kurd, wê IPU bi riya komisyonekî raporekê hazır bike. Civîna IPU'yê ya 89'emi de navbera 11- 17'ê Nisanê de wê li paytexta Hindistanê, li Delhiyê bicide. Ev rapora li ser Tîrîfîyât wê pêşkêşî vê civînê bibe.

Ew welatên ku mafê parlementerên xwe yên insanî nas na-kin ev in: Bûlgaristan, Sîli, Kolumbîa, Gîneya Ekvator, Haîti, Honduras, Endonezya, Maldives, Myanmar, Togo û Tîrîfîyât.

## lêkolîn

# Veqetandekên binavkiri kengê digihêjin navdêran?

## Deham Evdilfettah

Zêderê pendî (veqetandekên binavkiri) ê, a, ên, bi çî rîzanê digihêjin navdêran? Anglo kengê durist e ku bigihêjin navdêran û kengê nedirust e ku bigihêjin wan?

Em dizanin ku zêderê pendî digihêjin navdêran pendî (nas). Çî ew navdêran pendî bernes bin, çî celeb bin, çaxê ku navdêrekî pendî bête rewşkirin (pesindan), yan ji bi bernavekî, yan bi navderekî ve bête girêdan, hingê ew girêdan bi zêdereke pendî pêk têt, wekî:

- Dostê qenc bira ye.
- Evîna Cizîrî xudayî bû.
- Hevalê min dilsoz in.
- Ehmedê Xanî helbestvan e.

Hemû rîzimanzanê Kurdan -ji bili Reşidê Kurd- li ser vê rînusê (vekitê) digihêjin hev. Reşidê Kurd ji bi zêderê dixebeite lê ew zêderê dûrî navdêran dinivise.

Aloziya girêbend di babeta me de ev e.

Çaxê navê kalemêrekî Reşid be û niviskarekî Kurd bixwaze pirtûkêkê diyarî ewî kalemêrî bike, gelo dê çî diyariyê li ser pirtûka xwe binivise?

Mixabin gelek niviskarê dengdayî di diyariyê xwe de dikevin şâşiyê rîzmanî, çunkî gelek ji wan bi evî şeweyî dinivisin:

- ji apê Reşid re.
- ji xuşka Zîn re.
- ji meta Rewşenê re.

Ev hawayê nivîsandinê nedurust e. Çunkî nivîsandina zêderê pendî berî navdêran şâşyeye rîzmanî peyda dike. Hingê em nema dizanin mebesta niviskarê me ji pirsên "ap, xuşk, met" çî ye. Çunkî mebesta dilê wî ji ewan pirsan tiştek e.

Mebest ji ewan diyariyan ev e:

1- "ji apê Reşid re": Anglo ev pirtûk ji Reşid re ye ku apê niviskar e, yan ji mîna apê wî ye.

2- "xuşka Zîn": Anglo Zîna ku xuşk e yan ji mîna xuşkê ye.

3- "meta Rewşenê": Rewşena ku met e yan ji mîna metê ye.

Helbet mebesta dilê niviskar ji ewan nivîsaran ew e. Lê angoyê nivîsaran tiştekî dî dibêjin.

Angoyê nivîsaran:

1- "ji apê Reşid re": Pirtûk ne ji Reşid re ye, ji apê wî re ye.

2- "ji xuşka Zîn re": pirtûk ji xuşka Zîn re ye, ne ji Zîn bi xwe re ye.

3- "ji meta Rewşenê re": pirtûk ne ji Rewşenê re ye lê ji meta wê re ye.

Ev nivîsaran rabûrî diviyan ku wisanbihatana nivîsandin da ku angoyê wan li gora mebesta niviskarê wanbihatana:

1- "ji ap Reşid re" yan ji "ji apo Reşid re"

- 2- "ji xuşk-xuşkê- Zîn re"
  - 3- "ji met-metê- Rewşenê re"
- Ev "o, ê" yên binxêzkirî dûpaşkêne banesane ne. Ew dûpaşk di raweya bangkirinê de digihêjin navdêran bankirî.

Wekî:

- Lo apo, lo mamo!
- Lê metê. lê dayê!

Lê carina ev herdu dûpaşk ji bo şîrânî û nazdarîyê -ne di raweya bankirinê de jî-dighêje navdêran.

Rîzana ewê raweya nivîsandinê ji ev e: A- Zêdekerên pendî di evan raweyan de digihêjin navdêran:

1- Çaxê ku du navdêr yan navdêrek û bernavek li pey hev bêñ û navdêrê paşin yan bernavê paşin bireserê navdêrê pêşin be.

Wekî:

- Bavê Temo cotkar e.
- Hespê Sîno qenc e.
- Zevîya Reşid têr av e.
- Gundê me dûr e.

2- Çaxê ku navdêrê paşin rewşa (rengdêrê) navdêrê pêşin be.

Wekî:

- Hevalê dilsoz mîna bira ye.
- Gotina rast tal e.
- Armanca mezîn azadî ye.
- Demîn xwe kurt in.

B-Zêderê pendî di eva raweyan de nagihêjin navdêran:

1- Çaxê ku navdêrê pêşin serwerbe û navdêrê paşin salix be.

Wekî:

- Welat şerîn e.
- Azadî jiyan e.
- Zanîn ronahî ye.

2- Çaxê navdêrê pêşin rewşa navdêrê paşin be, ango navdêrê pêşin rewşke pêşxistî be.

Wekî:

- Birader Cemşîd name nivîsî.
- Mam Reşid welatperwer e.
- Mamoste hejar helbestvan e.
- Xanyar Celadet Bedirxanî ye.

Berçav e ku ew navdêran binxêzkirî rewşine pêşxistî ne. Çunkî dema ku em ewan rewşan vegérinî paşîya navdêrê pesindayî (rewşkirî), dîsan dê bibin rewşen ewan navdêran.

Wekî:

- Birader Cemşîd name nivîsî -ango- Cemşîd birader (ê ku birader e) name nivîsî.
- Mam Reşid welatperwer e.

Reşidê mam (ê ku mam e)

-Mamoste Hejar helbestvan e.

Hejarê mamoste (ê ku mamoste ye)

-Zanyar Celadet, Bedirxanî ye.

Celadetê zanyar (ê ku zanyar e)

Li gora répîvana ewan rîzanê rabûrî tête nasîn ku ew şeweyê nivîsandinê yê ku bi piranî di nav nivîsaran me de belavbuye şeweyekî şas û nedurist e.

Bi kurtebirî ne durist e ku bêle gotin "Apê Reşid", heger mebesta me ji gotinê "Reşidê ap" be, ya rast ku em bibêjin "ap Reşid" yan ji "apo Reşid" û wisan ji li ev rîzanê tête pîvan.

## Gerrek dîrokî li nav arşîvan

### Ked û Şêkirdarî

Dîroka cîgirtina elîsba Kurdî, ew neynika rewşa gelê bindest e. Astengêni siyasi, aborî û civakî rîbirê wê bûne û nehîştine, ku ew di nava welat da cî bigre û bive ozon, bikeve ber bîna xwediyê wê. Ji ber wê, iro em Kurd xwediyê elîsba sê rengî ne: Latînî, Erebî û Kîrîlî.

Riya peydabûna van hersê elîsban ne weke hev bûye. Jiyana wana çiqas dirêj bûye, hewqas ew ji hev dûr ketine. Ev dûrketin iro bûye kevirê ber piyê jiyana gelê Kurd a rewşenbîriyê û hêja ye em zêde bifikirin, ku çawa vî kevirî ji ser riya xwe hildin, bidin alîkî. Ji vî karî ra, bêguman, daxwaz, hevkari, zanîn û wext gerek.

Tev li vê, em divê bi objektîvi rola hersê elîsfbayen Kurdî di nav dîroka pêşketina rewşenbîriya gel da qîmet kin û bêjin, ku bêyî xwestina xêrnexwazên gelê me, wan elîsban iro ciyê xwe girtine û bûne çek di destê Kurdan de bona domandina heyînê, bona parastina zimanê dê, rewş û rengî Kurdiyî.

Li ser riya pêkanîna van hersê elîsfban-hereket, xwêdan û fedekariya zana û rewşenbîrân hebûye. Armanca van xoşmîran her tenê tiştek bûye: Gel bi çeka ronak-bîriyê ji jiyana tariyê û nezanînê derxin, nehîlin, ku Kurd ser zimanê Erebî, Farisî, Tirkî û zimanê xe-rib Kurdewariya xwe kêm kin, bîvin xizmetkarê tore û çanda gelên mayîn. Deynê me ye ku em xizmeta wan xoşmîran baş bianibin û bi hêjatî bişêkirînin.

Her car kîfa min bi wê tê, gava di kovar û rojanê Kurdî da ez li ser Celadet Elî Bedirxan dixwînim, dilovaniya Kurdê rewşenbîr hindava(hemberî) kirînen wiya bi rûmet dibînim. Baweriya min heye, li ser mîrê rewşenbîriya gelê Kurd wê hîn bê nivîsare û gelek rûpelên jiyanâ wî ya û bêne vekirinê, û ne ku tenê li meydana damezrandina elîsfbayê, pêşxistina bîr û baweriya netewayî, dîrokzaniyê, zimanîniyê, etnografayê û li meydanen dinê ji mezinaya wî bidin xuyakirinê. Her tenê nama wî ya bi navûdeng, a ku wî ji Kemal Ataturk ra şandibû nivîsareke zanyariyê ya giranbuha ye, destûreke siyasi ye, ya ku iro ji aktualiya xwe wîndekirîne.

Divê em nav bi nav xizmetkarê medeniyeta gelê xwe yêne hêja bi bîr bînin. Li ser wan binivîsin,

da ku dîroka rewşenbîriya gelê Kurd li rex dîroka şerkariya gelêri ya azadariyê neyê ji bîrkirinê û ciyê xweyê hêja bigre. Zanîna dîroka gel, ew zanîna riya pêşdaçuyînê ya iro ye, ew kaniya ruhdarbûnê ye bona ku çanda Kurdî em rakin ser hêlanen nû bilind.

xxxx

Daxwaza min e rûperekî nenas ji dîroka çanda Kurdîn Sovyetê ji bona xwendevanen Armancê vekim. Çanda Kurdîn Sovyetê (parçekî çanda gelê Kurd a giştî ye) di riya xwe ya taybetî re derbaz bûye. Ew bi salan ji sînor û hesarîn bê pêge ji Kurdistanê, ji deng û basen wê, di jiyana gelêri, tore û çanda wê qutkîrî bûye, lê bi bingeha xwe, bi rihe xwe ew ji dîroka gel nehatiye birînê û iro dike bîghêje maka xwe.

Ji me, ji Kurdîn Sovyetê tê xwestinê ku em dîroka jiyana xwe ya rewşenbîriyê û Kurdatiyê vekin û bikin milkê hemû xwendewarên



nîvîsar, çand û jiyana gelên biçük bû, yên ku di dema qeyserîye da ji van tiştan bêpar mabûn.

Gelên biçük li ser erdê Sovyetê pir bûn. Li ser hev ji sedî zedetir dihatin jimartin. Yek ji wan gelan Kurd bûn, ku ji wan piranî û ji welatê xwe qetiyanûn û li ser xweliya komarêni pişqavqazê, Asya navîn cîwar bûbûn. Salen bîstî li Sovyetê salen hişarbûna gelê Kurd bûn. Rewşenbîr nû peyda dibûn. Pîrsa çêkirina elîsba gelên biçük li ber guhdarya dewletê bû. Pêkanîna vê pîrsê komarêni pişqavqaz, hildabûn ser milê xwe. Ji rewşenbîr, zimanzen û zanayen bijare komîteya elîsba Tirkî ya nû bona Yekîtiya Sovyetê hat damezrandinê. Gelên biçük bi giranî Musilman bûn û koka hineka Turk (Turani) bû, ji ber wê ji komîte bi navê "Turk" hate navkirinê. Lî belê, wek em dibînin hin gel, her wekî Kurd, Asûrî û yên mayîn ne tûranî bûn, lê pîrsa elîsba wana ji bi vê komîte va hat girêdanê. Komîte wek bingeha bona elîsba gelên biçük herfîn Latînî nas kir, her tenê dima, wekî zimannasê her gelî ew bingeh li gork dengen zimanê xwe temam bikira.

Ji bo çêkirina elîsba zimanê Kurdî Kurdnasê bi navûdeng Orbelî û N. Mar xwe gîro kirin. Lî karê wan nîvco ma. Di vî warî de salen 1927-1928'a elîsba ku wî çêkiribû ji alî komîteya li jor bi navkirî hat qebûlkirin. Sala 1929'an bi resmî ji alîyê Komarêni Pişqafqasê hate qebûlkirinê û ew elîsba bona Kurdîn Sovyetê kete çerxa jiyânê.

Bi daxwaza, ev alîsba, êdî bingeh fireh girtibû di nava Kurdîn Sovyetê de di dawîya salen 30'ı de jiyana xwe sekinand û şûna wê di sala 1941'ê de bi qerara(biryara) hukûmete Ermenistanê ya NO 909 ya meha Hezîranê elîsba Kîrîlî kete çerxa dîrokê. Guhestina herfîn latînî ser bi herfîn Kîrîlî li Sovyetê her tenê ji bona Kurdî nîbû. Hemû gelên ku ser bingeha elîsba Latînî dinivîsin, ew ji derbasî ser elîsba Kîrîlî bûn. Ew guhestin netica politika Yekîtiya Sovyetê bû, daxwaza dewletê bû, da ku hemû gelên piçûk yên ku bi latînî dinivîsin zêde nêzîkî herfîn Kîrîlî bin. Helbet, gelên ku bi giştî ser xwaliya (axa) Sovyetê diman ev guhestin ji wan re windakirineke mezin nîbû, lê bona Kurdan ew derbeke xedar bû, çimkî piraniya gel, bi milyona Kurd li Kurdistanê diman û wana ji êdî bi saya elîsba Celadet Elî Bedirxan bi herfîn latînî dinivîsin. Destpêka elîsba Kîrîlî gaveke ziyandar bû bona gelê Kurd, çimkî ew elîsba sisya bû bona miletekî.

Kurd.

Sê babet hene ku ez bi taybetî vê gotarê binivîsim. Babetek ew e, ku çarenusa elîsba Kurdî ya yekgirî û kamil bona hemû perçen Kurdistanê bi aktualî dom dike û gere em zêde li ser wê bifikirin û gavêni bi piraktik ji bona miyaserkirina wê bavêjin. Babeta dinê ew e, ku li ser dîroka avakirina elîsba Kurdîn Sovyetê nîvîsareñ çewt hene (di nav nîvîsareñ Kurdîn Sovyetê da) û ew kêm û kurî payê pirê ji nezanîna faktîn dîrokî û ji tunebûna analîza bingehî tê. Ya sisîya di arşîva Casimê Celîl da ji sala 1929'a namek tê xudîkirinê ku hêjaye bê çapkirinê.

xxxx

Dema ku Yekîtiya Sovyetê bingeha xwe girt, ji pîrsê gîring, ku dewletê ji bo pêkanînê danî ber xwe, yek ji pêşvebirina ziman,

**Sekretera Giştî ya Yekitiya Afretên Kurdistanê Şerîn İbrahîm:**

# "Em jinê Kurd ji mîran ne kîmtir in"

Di hejmara berê de we hevpeyvîna hevalê me H. Diljen li gel wezîr û parlamentereñ jin ên Kurdistanâ Iraqê xwendibû. Di vê hejmara de jî em hevpeyvîna wî ya bi Sekretera Giştî ya Yekitiya Afretên Kurdistanê Şerîn İbrahîm re pêşkêş dikan.

**Armanc:** Tu kînga wek Sekretera Giştî hatî hilbijartin?

**Şerîn:** Me di 20. 2. 1992 de li Hewlêrê bi navê "Konferansa Leyla Qasim" konferanseç çêkir. Di wê konferansê de ez hatim hilbijartin.

**Armanc:** Bas e, berê te di nav tevgera rizgarîxwaz de çi kar dikir?

**Şerîn:** Ez berpirsiyara liqa 1 a Yekitiya Afretêni (Jinê) Kurdistanê bûm û endama komîta Mêhîlî ya PDK'ê ya Amêdiyê bûm. Ez niha jî endama PDK'ê me.

**Armanc:** Tu dikanî di derbâriyî yekûtiyê de me hinekî agahdar bikî?

**Şerîn:** Di sala 1952'an de hat damezrandin. Yekitiya me ji 4 liqan pêk tê. Liqê 1'ê li Dihokê ye, liqê 2'ê li Hewlêrê ye. Liqê 3'ê li Kerkûkê ye, û liqê 4'ê li Silêmaniye ye. Bi girêdayî her liqê komîtyen meheli hene. 8000 endamê me hene. Ji bo kongrê yan konferansê, ji bo 20 endaman nûnerê tê hilbijartin û di kongrê de liq yan jî herêma xwe temsîl dike. Di konferansa me ya dawîn de 176 nûner beşdar bûbûn. Kongre ji bo Sekreteriyata Giştî 15 esil û 5 cîgiran hildibijêre. Ev 15 endamê Sekreteriyata Giştî dîvin û ji nav xwe 5 kesan ji bo Sekreteriyata Karbirêvebir hildibijêrin. Her endameka Sekreteriyata Karbirêvebir mesûla liqekî ye. Ji komîtyen herêman heta Sekreteriyata Giştî hemû organêne me bi hilbijartîn tê ser kar.

**Armanc:** Li gor cenabê te, niha muşkileyen jinê Kurdistanâ Iraqê çi ne?

**Şerîn:** Muşkila jinê Kurd a sereke bi taybetî di qada aborî de ye. Ku di warê aborî de muşkileyên jinê nebin ew dê bigihê armancê xwe yên din jî. Gotinek heye, dibêje "ku jin di warê aborî de rizgar nebe di warê komelayetî rizgar nabe".

**Armanc:** Hün çawa dikarin jinê Kurd bi cesaret bikin ku bikarîbi di kar û barê bi rîvabirina civî le roleke aktifstir bigirin. Jin û mîran bi hev re welat rizgar kirine, lê ev welat rizgarkirî bes ji aliyê mîran ve tê idarekirin. Bi a te ev yeka ne bê edaleti ye.

**Şerîn:** Rast e, bê edaleti ye. Lî sedemê vê yekê hene. Bi qasîku ez dizanim mesele ne mesala tîrsê ye. Çimkî mîren me bi xwe hîn rizgar nebûne ku jinê me jî rizgar bin. Gava ku mîren Kurdistanê ji her alî ve xwe rizgar kirin, wê demê dê jinê me jî rizgar bin. Heta niha mîren me bindest bûn. Tu fersend nedîstine ku mecalê bidin jinê xwe ku ew jî bikarîbin

xwe biavêjin hemû karan.

**Armanc:** Tesîra İslamiyetê ji di vê meselê de tune ye?

**Şerîn:** Na. Bi qeneta xwe ez miroveke Misliman im. Ez nikarîm bêjim di vê meselê de roleka İslamiyetê a mezîn heye. Rast e, ku em mîjuya (tarîxa) xwe vekin, hin şex û meleyan tesîrek negatif li mîletê me kiriye û gotine ku gava jina Kurd biçe mektebê kufr e, ku jina Kurd rewşenbîr bibe kufr e, ku jina Kurd dest biavêje qelemê û bizanibe jiyan ci ye kufr e. Tesîra van tiştan di hin cîhan de bûye. Lî mîletê me roj bi roj bi pêş dikeve û berê wî ber bi demokratîyetê ve ye. Em nabêjin ku divê mirov ji İslamiyetê mehrûm bibe. Lî mesela İslamiyetê divê mirov cuda bigire. Jinê Kurd, ci li Kurdistanâ Iraqê, ci jî li perçeyen Kurdistanê yên din be, di dereca wehşetê de zîlm û zordarî dîtine û li dij van şer kirine. Ji ber wê, ez ne bawer im ku jinê Kurd jiyaneka wek jiyana jinê Sûûdî yan jî wek ya yên Iranê qebûl bikin. Û jiyanke weha ne layiqî jinê me ne jî.

**Armanc:** Ji bo pêşerojê daxwaz û planê te çi ne?

**Şerîn:** Hedefa min a yekemîn tam rizgar bûyina mîlet e. Ya didyan, ez dixwazim xwendina xwe teva bikim. Ez xwendekara Fakulta Zireetê bûm. Heta niha min keys nedît. Ez berî şoreşê xwendekara Unîwersiteyê bûm. Min divê ez niha xwendina xwe temam bikim. Û gav bi gav xwe bavêm hemû karan, xizmeta mîlêt xwe bikim.

**Armanc:** Ji malbata we heta niha tu kes sehid bûye?

**Şerîn:** Belê. Li Kurdistanê malbatê ku şehîd nedane nînin. Ez xwişa Şehîd Simkoyê Amîdiyê me. Birayê min mesûlê Liqê-1'ê bû. Di enfala 1988'an de şehîd bû. Yekem kes bû ku li wê mintiqê agirê partiyê venemirand û şehîd bû.

**Armanc:** Tu kovar an rojnameya Yekitiya we hene?

**Şerîn:** Bi rastî kovara me ya bi navê Dengê Afret ji mîj ve heye. Hejmara yekem di sala 1984'an de li Iranê derçû. Heta niha 5 jîmar derçûne. Wê demê şert ne musâid bûn ku em vê kovarê li Kurdistanâ Iraqê belav bikin. Niha me bi hemû liqen Yekitiya Afretên Kurdistanê biryar sitendiye ku em du kovaran derxîn. Ji wan yek bi awakî nû berde-wamkirina Dengê Afret e, ku hejmara şesan bi şiklê rojnamê me hazir kiriye û daye çapê, wê van rojan derkeve. Û ya didyan jî Di Komel -Civatê- de Riz-



Şerîn İbrahîm: "ez ne bawer im ku jinê Kurd jiyaneka wek jiyana jinê Sûûdî yan jî wek ya yên Iranê qebûl bikin." (Foto: Armanc)

gariya Jina Kurd e.

**Armanc:** Me ji Zaxoyê heta Helebçeyê li gelek cihan penahendeyen ku ji Iranê vege riyaneye ziaret kirin. Bi rastî rewşa wan pir xirab e. Di vê germa Kurdistanê de ava wan tune, kanalizasyon naxebitin. Xwarina wan têr nake. Di nav wan de, rewşa jin û zarokan xirabtir e. Hün wek Yekitiya Afretên Kurdistanê li hember vê rewşe nikarin tiştekî bikin?

**Şerîn:** Ez bi xwe yek ji wan jinan im ku ev heş sal in li ne-wal û li çiyan û li Tirk û Iranan min derbederi dîtiye. Min gelek nexwesi dîtin. Bi taybetî di warê aborî de, rewşa jin û zarokan me ne baş e. Ji derive, ji aliyê dezge-hen navnetewî ve gelek alîkarî ji bo me tê şandin. Lî belavkirina vê alîkaryê heta niha bi awakî durustane nebûye. Hün mîletê me jî negîhiştiye wê têgîhiştinê ku bêje ez têr im, bila ev tiştâ ji cîranê min ê birçî re be. Ji xwe ku em bi xwe yek bûna û li hember hev bi rehim bûna heta niha em bindest nedîman.

Li gor lêkolînê ku heta niha me kirine, 15 hezar jinê me mîren xwe winda kirine û li ser sê-wiyen xwe ne. Ji van hinan di êrisa 1988'an de, hinan li Helebçê, hinan jî di qetilkirina wan 8 hezar Barzaniyan de mîren xwe winda kirin.

Ji bo alîkaryâ van jinê me û sêwiyen wan, me berê xwe da dezge-hen inşanî yên navnetewî, wek

re bibêjin ku ew jî bikarîbin di parlamento û di hukmatê de hel bikin.

Berî her tiştî bi damezrandina Hukmata Kurdistanê hemû din-yayê dît ku Kurd ji dikarin hukmatê û dewletekê ava bikin û bi rî ve bibin. A din bi hilbijartîn û bi damezrandina Hukmatê, me ji bo dînyayê ispat kir ku em li diji diktatoriye ne û demokrasiye dixwazin. Ez hêvîdar im, ku em bi parlamento û bi hukmata xwe di civaka xwe de demokrasiye bi cîh bikin. Di vê riyye de em çigas bi ser kevin, dê ewqas dinya baweriya xwe bi me bîne û Kurdistanâ Tirkîye jî zûtir bigihê armanca xwe. Ev yeka jî dikare bi yekgirtina me pêk bê. Ku her parti ji bo xwe dergehekê veke û bes endam û li alîgîren xwe bifikire û mîlet li alîkî bihêle, em nikarin bi ser kevin. Ez hêvîdar im ku weha nebe.

**Armanc:** Li Kurdistanâ Iraqê, her çigas bi resmî nehatibe ilan kirin jî, fîlli dewleteke Kurd heye. Çima li cîhîn resmî, wek li parlamento û li dezgehîn din, ala Kurdistanê nîne. Ku her parti ala xwe daleqîne, wê çawa yekitiya Kurdan çêbe?

**Şerîn:** Berî her tiştî ez dixwazim diyar bikim ku ez bi xwe jî ji vê yekê ne kîfxweş im. Ji dewletê din gelek kes û heyetên resmî têr û dema ku dibînîn bi her dergehekî ve rengek heye, ji me dipirsin. Em zehmetiyê dîksînîn ku ji wan re izeh bikin. Em bi vê rewşê pir nerehet in. Hêviya me ji hemû hizban ew e ku alaya me ya rengin; kesk, sor û zer li hemû deveren Kurdistanê li ba be.

**Armanc:** Niha li nav Kurden Kurdistanâ Iraqê munageseyek heye. Hin Kurdistanê serbixe dixwazin, hin Kurdistanê federal dixwazin, hin otonomoyê dixwazin. Bas e wek sekretera giştî ya Yeyitiya Afretên Kurdistanê tu çi dixwazî?


**Şerîn:** Bi a min li ser bingeha demokrasiye federasyon di şertîn Kurdistanê û yên cîhanê yên iro de rasttir e. Lî di pêşerojê de, li gor şerîn Kurdistanê û yên cîhanê, mîrov dikare li ser armancê din jî bifikire...

**Armanc:** Tu ji bo jinê Kurd yên li derveyî welat û yên li perçeyen Kurdistanê yên din dixwazî tiştekî bêji?

**Şerîn:** Daxwaza min ji hemû jinê Kurdistanê, bi taybetî jinê bindest , ew e ku yekgirtî bin ku bikarîbin bigihê armancê xwe. Û her weha divê em tîrsê li alîkî deynin. Wek her mîrekî, wezîfe û heqê me jinan e jî ku em bi mîren re mil bi hev din û dest biavê-jin xebatê. Em jinê Kurd di tu warî de jî mîren ne kîmtir in. Tu karê ku em ji heq dernekevin nîne. Lî serê her tiştî divê jinê me yekgirtî bin. Bêyi yekgirtinê serketin ne mumkin e.

Wezîrê Perwerdekarî  
Dr. Nasih Xefûr Remezan:

# Problema mezin meaşê mamostayan e



Dr. Nasih: "Îro ji %50 zêdetirê mamostan û xwendekaran jin û keç in." (Foto: Armanc)

**Armanc:** Tu dikari xwe ji bo me bidi naskirin?

**Dr. Nasih:** Sipas ji bo rojnama Armanc ku ev firsend da min ku ez bi riya we bikaribim dengê xwe bigihînim Kurdên dilsozên li derveyî welêt.

Navê min Nasih Xefûr Remezan e. Di 1948'an de li Kerkûkê ji diya xwe bûme. Xwendina seretayî, navendî û lise min li bajarê Kerkûkê temam kiriye.

Salêن 1968-69 ketim nav hêzên şoreşa Kurdistanê; bûm pêşmerge, di 1969'an de li Tewêleyê bûm mudîre mektebê, her wiha min ders ji dida.

Piştî peymana 11'ê Adarê 1970 çûm Sovyetê, li Ukraynayê, li bajarê Kîvê, min Fakulta Kîvê qismê "Pêwendiyên Internasionalî" di 1976'an de temam kir. Di 1979'an de min doktora xwe ji temam kir. Doktora min ji ev bû "Kêsey (gelş) Kurd li nav şerê cîhanî yê yekem û duwem da".

Paşê vegeiyam Kurdistanê. Li Ewrûpê endamê Xwendekarî Kurd bûm.

Li nav partiyê ji endamê cigirê Komîta Navendî me. Di salêن 1980-81 li Kurdistanê di nav PDK de di besê ragiyandinê de mesûl bûm. Piştî 1987 disa çûm Sovyetê, li wê derê nûnerê PDK'ê bûm. Disa her min xwend, lê ji ber rewşa xwe, 1990 çûm Swêdê min iltica kir. Paşê li ser daxwaza PDK'ê careke din vegeiyam Kurdistanê.

Nuha ji bûme Wezîrê Perwerde. Şîran dînivîsim, bi navê "Rêgây Kolnedan" di 1986'an de diwaneke min di Çapxana Xebat de derket, lê navê min wek nivîskar di vê diwanê de N. Bebek e.

**Armanc:** Bi giştî programa xebatê ya Wezareta Perwerde ci ye?

**Dr. Nasih:** Wekî dizanin perwerde di her civatekê de roleke sereke dilîze. Ji alî me ve, wek

cephe, wek parlamento em qiyeteke mezin didin perwerdekarîyê.

Perwerdekarîya zarok û neviyên me muhîm e Ew dahatuyên me ne. Her çendî li hemû parçen Kurdistanê perwerde heye, û bi taybetî li Kurdistanâ Iraqê ji bi Kurdi ye; lê ferqa wê ya ji îro ev e ku; perwerdeya me di çarçewa bîr û baweriyeke nişîmanperwerî de ye.

Hedefa me ew e ku em bikarîbin ji nû ve bîr û baweriyeke nişîmanperwerî, Kurdayetî, navnetewî, aşîtiyê bigihînin neviyên xwe. Bêguman ji bo vê ji zanîn û karîn divê. Wext divê, hêz divê, hêvîdar im em bi ser kevin.

**Armanc:** Wezareta Perwerde dixwaze mirovan ji bo kîjan armancê perwerde bike? Yanî hunê bixwazîn tîspekî çawa li Kurdistanê bigihînin?

**Dr. Nasih:** Armanca me ew e ku em neviyên îro û yên musteqbel bigihînin. Wekî min li pêşî ji got em dixwazîn xwendekar yan ji neviyên xwe nişîmanperwer, aşîtiywaz bigihînin ku bikarîbin li hember gel û welatê xwe, xwe berpirsiyar bînîn.

**Armanc:** Ta nuha hîndekari bi zimanê Erebî bû, lê zarokên Kurdan bi Kurdi ji dixwendin, nuha ji hûnê disa bi Erebî bidominin, yan hemû ders wê bi Kurdi bin?

**Dr. Nasih:** Bêguman yek ji wezîfeyen ku li ser milê me ye ew e ku, qonax bi qonax xwendin li Kurdistanê bibe bi Kurdi. Yanî xwendina esasî bibe bi Kurdi, lê bêguman ji bo vê ji wext divê, imkan divê, em hewil didin ku di qonaxa seretayî de, dersên Kurdi bidin; ger ne ji sedî sed be ji, lê dersên esasî bi kêmânî bi Kurdi bîn dayin. Emê gavê xwe yên îro welê bavêjin ku demên pêşde xwendin bi temamî bi Kurdi be. Çunkî em xelkê Kurdistanê ne, zimanê me Kurdi ye. Li gel wê

emê dersa Erebî ji bidin xwendin, em mecbûr in, çunkî em li aliyekî din bi ser welatekî ve ne ku jê re dibêjin Iraq û heta îro ji em hê ji vî welatî veneqetiyane. Ji ber wê ji emê Erebî ji wek ders bi zarokên xwe bidin xwendin.

Her weha ev heq çawa ji bo Kurdan heye ku bi zimanê xwe bixwînîn, divê ji bo hemû eqeliyîtên Kurdistanê û Iraqê ji hebe. Erebîn di nav me de ne ji heqê wan e ku bi zimanê xwe bixwînîn, lê li gel dersên Kurdi.

**Armanc:** Muşkileyên mamoste û materyalan hunê çawa hel bikin?

**Dr. Nasih:** Dixwazim berê sipasi mamosteyen Kurdistanê bikim, çunkî mamosteyen Kurdistanê xwedî roleke pîroz, nişîmanperwer û qehreman bûn, ji bo gîhîstina vê qonaxa îro. Li gel bêmeasî, li gel mekteb û sinifên xerab, li gel vê aboriya xerab mamosteyen me roleke mezin dibînîn û bi can û dil dixebeitin daku zarokên me bê mekteb û xwendin nemînin. Herweha xwendevanê me ji bi xwendinê mijûl in û serkeftî ne. Lê muşkila mezin ew e ku em nikarin meaşê mamostayan bidin.

Ji alî materyalîn dersê ve, Tarix, Cografya, Perwerdeyi Nişîmanî, ev dersana divê em ji nû ve çêkin. Çunkî di kitêbên berê de her bîr û baweriye BAAS û Erebperwerîye hene. Divê ev kitêb bêne guhertin. Çunkî li Kurdistan nayê. Tarix ji coxrafya ji.

Me komîteyek ava kiriye daku van kitêban biguherin, ji nû ve çêkin. Eger imkana me ya aborî dest nede ji wek malzeme emê di dersan de bidin xwendin. Yanî ne kitêb be ji, wek rûpel, fotokopî an broşur emê çap kin.

Lê bi kêmânî emê ji bo mamosteyan çap kin, daku ew bikarîbin wek ders bidin zarakan.

**Armanc:** Hunê di perwerdeyiye de tîpên Erebî an ji tîpên Latîni bi kar bînin?

**Dr. Nasih:** Bêguman li Kurdistanâ Iraqê heta îro her bi tîpên Erebî xwendin heye. Ev ji ji ber wê ye ku em li nav Iraqê dijîn û welê hatine perwerdekarin û jîyan e, ji ber wê ye ez bi pêwistî nabînim ku em herfîn xwe yên îro biguherin, bikin herfîn Latîni. Lî divê di qonaxa xwendina mekteban de herfîn Latîni ya alfaba Kurdi ji fêrî xwendekaran bikin. Divê Kurd bi tîpên Latîni bîzanîbin, çîmkî Kurd tenê li Kurdistanâ Iraqê najîn; birayen me yên Kurdên Tirkîyê û Suriyê û yên derveyî welêt bi herfîn Latîni dînivîsin.

Ji ber wê ji di nawendî û lisê de divê em xwendekarê Kurd hînî tîpên Latîni ji bikin.

**Armanc:** Di mesela organizekirina hîndekari û perwerde de hûnê ji ku dest pê bikin. Program, teşkilat mamoste, materyal...?

**Dr. Nasih:** Bêguman, berî her tişti pêwistiya me bi damezrandina Wezareta Perwerdekarîye heye. Ji bo wê ji me taslaxa rîxistina wezareta xwe amade kiriye û emê pêşkêsi encumena weziran bikin, daku bikarîbin biryarekê li ser bigrin.

Organiza perwerdekarîne divê hemî bi hev re were çareserkirin. Ji wezareta perwerdekarîye bigre heta bi têkiliyê mamoste û telebeyan, hemû girêdayî hev in. Ji ber wê ji divê pêşî em programa xwe (taslax) amade bikin û bidin Encumena Weziran, ku ew li ser muwefeq bin. Paşê emê têxin jîyanê. Bêguman ez her wext dibêjim, ji bo wê ji maddiyet divê. Lî dîsa ji pîrsen perwerdekarî yên ewil divê em derxin pêş, pêşî divê em wan çareser bikin; divê li Kurdistanê her di bin ci şertî de dibe bila bibe, divê ku xwendin û mekteb ranewestin. Divê xwendin her hebe.

**Armanc:** Muşkila we ya herî mezin ci ye?

**Dr. Nasih:** Muşkila me ya herî mezin aborî ye. Ev berpirsiyariya pîroz a ku ketiye ser hu-

stuyê parlamento Kurdistanê, divê em çareyekê jê re bibînin. Bonimûne li seranserê Kurdistanê iro tenê meaşê mamosteyan ji bo mehekê nêzikî 9 milyon dînaran e. Ü em nizanîn çawa peyda bikin. Bêguman em hewl didin ku çareser bikin. Çi bi alîkariya xelkê Kurdistanê be, ci bi riyan rîxistinê navnetewi yên xêrxwaz be, ci bi raya UNESCO, UNICEF û a nuha ji bi riya we ez ban hemû Kurdên derve dikim ku bikarîbin alîkariyekê bi me re bikin. Alîkariji heqê qelem û defterekê bigre, heta bi avakirina mektebekê, ci dibe bila bibe her alîkariyek maddî bo me dermanek e, ji bo çareserkirina problemen milletê Kurd. Ji bo mamosta û xwendevanan, di wextên zor de gelek tiş dikarin rawestin, lê xwendin û zanîn tu car nabe ku rawest e. Çunkî serçaveya jiyana Kurdistanê ew e. Ew ji bi destê mamostayan e. Mamoste ji divê ku bikarîbi jiyana xwe bidomîne.

**Armanc:** Di teygera rizgariya Kurdistanê de jin û keçen Kurd roleke mezin lîstine, lê bi eynî nîsbetê di birêvebirina karûbarê civakî de xuya nake, ev bê balansî wê çawa rast bibe? Ji bo perwerdekarîna jînên Kurd programeke we ya taybetî heye?

**Dr. Nasih:** Bi min, jin ji destpêka jiyane ta îro rola xwe ya pîroz bi cîlî tîne. Jin li nav malê yekem kes e ku bi zarakan re rû bi rû ye. Yekem kes e ku zarakan perwerde dike.

Bêguman, di nav civatê Rojhelat de qiymeta ku divê bête dayin nedane jinan, lê tevî wê ji ciyê jînê di nav civata Kurdistan de heye.

Îro ji %50 zêdetirê mamostan û xwendekaran jin û keç in. Di wezareta me de ji jin pir in.

**Armanc:** Tiştekî din ku tu bixwazî bibêji heye?

**Dr. Nasih:** Bila bispor û zanayen me, doktorên me vegeerin welêt. Aboriya me gelek xerab e. Pêwendiyê bi her kesê Ewrûpî re, ji dezgehê insanî bigre heta bi yên siyasi re deynin, ji bo ku bikarîbin alîkariya me bikin, ku xwendin li Kurdistanê raneweste.

Hevpeyîvin: Leyla Aydin

## Li ser alfabe û zimanê yekgirtî ditinên hin Kurdistan başûr

Sewqî: (ji Partiya Zahmetkêşen Kurdistan), Şeçlawe

Mesela ziman û alfabyeke yekgirtî tiştekî pîr zerûrî ye. Pêwîste em ji niha ve gavan bavêjin, TV, rojname di vî warî de roleke mezin difizîn. Pêwîste e komîten müsterik bêne çêkirin. Nûke dewrîn (kurs) tîpên Latîni hatine vekirin. Tîpên Latîni çaktır bersîva zimanê Kurdi dide. Deng xwestir fîn nîvîşîn.

H. Hişyar (ji Partiya Komunist a Iraqê), Dihok

Zimanê Kurdi deng bi herfîn Erebî nade. Ya din herfîn Latîni ciwantir in. Xwendevanî dîbistanan de hêsanîr ferî herfîn Latîni dibin, nîsbet yên Erebî. Ya din jimara Kurdên ku tîpên Latîni bi kar fîn pîr in li gor yên Erebî. Ji bo zimarekî hevgirî ji çend rî hene ku mirov dikare pêk bîne. Bo nimûne; em dikarin komîtekê ji kesen pispor ava bikin. Ji peyvîn müsterik ji hemû zaravan ferhengek bête durustkirin. Peyvîn biyani yên navnetewi bila wekî xwe bimînin. Em wekî Erebîn nekin. Erebî navê telefonê, sînemê, TV ê guhertine.

Teyar (ji Partiya Demokrat a Kurdistanâ Iraqê), Dihok

Berî zimanê yekgirtî, divê em alfabyeke yekgirtî pêk bînîn da ku em hev bas têbigîn. Nûke em li kesekî zîrek digerin ku bikarîbe dersên zimanê Kurdi bi Latîni bide xwendevanî. Daxwazeke mezin di nav gencan de ji bo fîrbûna tîpên Latîni heye.

Saed (ji Partiya Zahmetkêşen) Hewlîr

Zimanê yekgirtî dê demeke dirê bajo. Lî em dikarin hewl bidin ku ev dem kin be. El-fabyeke yekgirtî pêwîst e. Latîni çaktır e. Bo demekê mirov dikare hemû zaravân Kurdi bi Latîni binivise da ku mirov fer bibe. Ez behdîni bi Latîni dîxwînim eger soranî bi Latîni bê nîvîşîn ez dê hêj hesantir bîxwînim.

Zêrevan (ji Partiya Demokrat a Gelê Kurdistan) Amêdiye

Zimanek yekgirtî bo her mîletekî pêdivî ye. Bi taybetî bo Kurdan ev hêj zerûnîr e. Ji ber ku em çar perçe ne û zaravân Kurdi pir in. Divê komîyonek ji zimanzan bê avakirin û li ser vê kîşê rawestin. Tîpên Latîni başûr bersîva zimanê Kurdi dide.

Hecî Kardoxî

# SADIQÊ EMER Û "WELATPARÊZÎ" YA WÎ

## Zinar KÊSTEYÎ

Berî çendekî, dema rojnama Welat, hejmar 23'an ket destê min û cavêن min bi gotara li ser Sadiqê Emer ket û min ew xwend, ez şâş mam. Rojnama Welat Sadiqê Emer bi awayekî wusa bilind kiriye, biriye rêza qehreman û serkêşen şêhidên Kurdistanê û ji berîka xwe komeke pesnê bê bingeh ji bo wî rêz kirene. Wek: "Zana û pêşverû, şoresger û welatparêz" ûhwid. Ji ber ku gotar pir dirêj e, ez nikarim tevê biguhêzim vir. Lî sernivîs û çend rêzên bi herfîn gir hatine nivîsin, ez ê bidim pêş cavêن xwendevanan. Sernivîsa rojnama Welat: "SADIQ OMER: Geşbûna dilê gelê Kurd. Agirê Şerî Rizgariya Netewî... Welatparêz bû, ji ber ku ji zarohtiya xwe û vir ve ji bo welatê xwe çek ji dest dananibû... Şoresger bû, ji ber ku ji pêşketinan re vekirî bû û tu caran xwe ji gel qut nedikir, gel biçük nedidit û herdem dixwest xwe û gelê xwe zana bike. Pêşverû bû, ji ber ku dema heqîqeta hêzên qewmiyatkarê hov dît, ji wan dûr ket û li cem rastî û durustiyê, cihê xwe girt û bû parêzgerê heqîqetê."

Bi rastî dema min ev gotar xwend, pir kenyam û paşê min got: Hey wax. Ev jî ji bextresiya gelê Kurd e. Biyaniyan û dijminan dîroka me bêrevajî nivisiye û iro jî hinek aliyan siyasi wek "Welat" û xwediyan wê peyda bûne ku dijminen gel ji bir kirine û ketine qırka Kurdan.

Her Kurdê ku wek wan nebe, xayîn e, xwîna wî helal e. Ji bîlî wan hemû partî û rêxistinêni siyasi ajan in, û divê bi kuştinê ji nav bêne rakirin. Her rojname, kovar û bingehênan zanîstî û kulturî ku ne bi destê wan hatibin çekirin, divê bi gef û tirsê bêne hilanîn.

Kîjan hêzza Kurdistanê bi kîjan hukûmeta dagîrker re danûständin bike, xiyanet e, lê ew bi xwe çi bikin, ne xiyanet e, zîrekî û siyaset e... Dîsa kî ji wan re bêje "ezbenî, ez bi we re me û hun rast û dirist in", tarîxa wî çendî reş û tije xiyanetkarî be jî, ew cardin şoresger û welatparêz e.

Ez naxwazim xwe bêxim navbera hêzen siyasi. Lî ez wek Kurdeki, wicdanê min qebûl nake ku dîroka gelê Kurd bi xalêñ reş bêt kirêtkirin. Û ez yek ji kurêñ wê deverê me ku Sadiqê Emer lê dijiya, û ez baş û ji nêzik ve vî mirovi nas dikim.

Ez dixwazim çend rastiyêñ ku min bixwe dîtine ji xwendevanêñ hêja re xuya bikim. Bila xwendevan dawiyê bîryarê bidin ka Sadiqê Emer kî ye.

Sadiq kurê Emer axayê Salihî Binemala wan ji "Mala E... e ku yek e ji binemalêñ axayê nevera Zaxoyê ye. Di dawîya salêñ 1970'an de hat nav rêzên pêşmerge. Piştî demekî bû berpirsiyare grûbeke pêşmerge (60 kes). Wê demê berpirsiyariya xwe ji bo xwe delîve zanî û heta ji dest hat, mirovîn eşîra xwe li xwe kom kirin.

Sala 1986'a dema pêşmergên Kurdistanê qeseba Mangêş rizgar kir bavê wî Emer axa, tevî çend kesen din, dest bi dizî û talan kîrina xelkê kirin. Ji ber vê yekê ew hate bankirin bo mehkema

şoreşê. Lî ew reviya û çû xwe teslimi Firqa Zaxo kir û bi aşkirayî dest avête karêñ xiyanet-kîriye li dijî gel û şoreşê.

Hingê Sadiqî û babê xwe, tevî istixbarata Zaxo, ji bo xelaskirina General Mewlûd ku di sala 1984' an de pêşmerga ew ixsir kiribû, listikek danîn. Sadiqî ji serokatiya şoreşê re got ku ew dixwaze bo-riya petrolê ya ku ji Zaxo diçe Tirkîye biteqîne. Dema ku "cûn" boriyê biteqînin, yekser cûn Zaxo. Sadiq vegeeriya nav pêşmergan, got "em ketin kemînê, ez bi tenê xilas bûm, min mirovek şand nik berpîrsê firqa Zaxo. Wî got ye: "Eger pêşmerge General Mewlud berdin, emê ji hevalen we berdin". Şoreşê xwest hinekî meselê vekole, lî Sadiqî zanî ku dê eşkere be, berî cewaba şoreşê, revî çû xwe teslimî firqa Zaxo kir.

Li başûrê Kurdistanê pir axa û xwefîros hebûn û wan pir hewil didan, heyâ ku dibûn serok-caşen normal. Lî serokcaş-hîsiya ser bi istixbaratê ve?! Kêm axa hebûn, di xiyanetê de bi vê meramê şad dibûn. Ji ber ku pereyekî pir pê dihate wergirtin.

Lî Sadiqê Emer ji ber vê xizmeta dûr û dirêj a ku wî ji rejîma Baas'ê re pêşkêş kiribû, yekser bû serokcaş-hîsiya fewcek (tabûrek) istixbaratê.

Di vê demê de ci dever neman ku Sadiq bi caş û eşîra xwe ve hêris nebirine ser .

Sala 1987'an Seddam pismamê xwe yê ji wî hovtir, Elî Hesen El Mecîd, yê ku Kurd niha jê re dibêjin Elî Kîmyawî, kir berpirsiyare şewitandin û xirabkirina Kurdistanê. Û bîryar da ku ci gundêñ ku dikevin bin desthilata pêşmergayan divê bi firoka, bi tanqan, bi agir û bi şefelan (dozer) bêñ xirakirin. Û hemû benderuhêñ di wan gund û deveran de gerek werin qirikin.

Topa Sadiq Emerî (ya 82 mm.) tirimbêlê de û li pêşîya eskerê dijimin her roj hêris dibire ser gundekî. Dema ku mirov bi destê wan nediketin ku bikujin û xanî bi destê wan nediketin ku bişewîtin, diçûn dexl û danê ku gundiyan, bi xwîdana eniya xwe li bêderê kom kiribûn, dişewitanîn.

Nimûneyek ku min bi cavên xwe dîti: Em grûpeke pêşmerge bûn wezîfa me ew bû ku em gun-dêñ Bamernê, Dawidiyê, Şîrtê, Şêxmemâ, Culê û Zêwe ji hêrisen dijimin biparêzin.

Roja 4.6.1987'an hêriseka dijiminî hate ser vê deverê, pêşmergan bi qehremaniya xwe dijimin şikand û nehiştin yek pêngavê ji werne pêş. Roja 7.6.1987'an cardin hêzaka mezintir ji cahş û esker û bi serokatiya Sadiqê Emer û çend serokcaşen din, dîsa hêrisa xwe dûbare kirin. Vê carê ji pêşmergan û hêzên gel berxweda-neka hêja kirin.

Sadiq û hevalen xwe ji ber wê yekê alîkariya tanq, top û firoka û çend fewcêñ (tabûren) cahş û eskeran xwestin. Roja 9.6. 1987'an serê sibê, bi topbaraneke dijwar û hêzaka mezin ji hemû aliyan ve hêris anîn. Di vî şerî de tîna dile Sadiqê Emer bi topa xwe ya ku ji nav şoreşê biribû, danibû raserî

gundê Şêxmemâ û bi destê xwe topbarana gund û çepereñ pêşmergeyan dikir. Dema ku gencen Gundê Geberazkê, ew nas kirin û xwestin wî bi saxî bigrin, bi telsiz alîkarijî hîsî-kopteran xwest û wan, ew xelas kir.

Havîna 1987'an tabûra wî hate veguhaztin bo gundê Ravîna li de-vera Kanîmasê, ji ber ku devereke stratejik bû, hem ji bo dijimin hem jî ji bo şoreşê. Sadiqê Emer, di vê demê de, çend hêrisen bi lez anîn ser baregayê pêşmergeyê Partiya Komunîst, li binya çiyayê Metîna, li Gelyê Hespa.

Di seva 12-13.9.1987, hêzên pêşmergeyê Kurdistanê, hêriska dijwar û bi gernasî bire ser bingehêñ dijimin ên li devera Kanîmasê û di egerê de never bi dirêjya nêzîk 40 km. û firehiya 30 km. hate rizgarkirin û 5 fewcêñ dijimin tevî qereqolên wan ketine destê pêşmergeyê Kurdistanê.

Ji van fewcêñ ku hatine girtin yek jî ya Sadiqê Emer bû !!

Berpîrsiyare fewca eskerî ji hate esîrkirin û serok cahşek bi navê Muhemmed Nezîf ji hate kuştin. Sadiqê Emer û hevalen xwe û serokcaş Bayîz Baraşî, pişî çend seitan ser kirin dîtin ku vê carê xelasbûna wan tûneye. Sadiqê Emer û Bayîz Baraşî tevî 35 cahşen din esîr (dîl) bûn. Di vê demê de ku wan gundiyan şoreşger dixwestin wan veguhêzine baregâyê pêşmer-gan yê li gelyê Bêşîlê, li binya çiyayê Metîna, Sadiqê Emer xwe gihande hinek kadir û pêşmergeyê hêzaka ku nuh hatibûn wê deverê, ku hebûna wan li wê deverê pir lawaz bû û dixwestin bi ci awayî dibe bila bibe, hinek mirovan li xwe kom bikin. Bi vî awayî Sadiqê Emer ew jî xapandin û soz da wan ku gava ew nehêlin ew bikeve destê pêşmergeyê PDK'ê ewê tevî eşîra xwe here nava wê hêzê. Çend mehan dan û standin li ser hatin kirin. PDK û, dixwest ku li gor xiyaneta wî vekolîn çêbibe û ew bê mehkeme kirin. Lî hêza din ti-mayî di eşîra wî de dikir û xwest wi biparêze.

Havîna sala 1988'an, dema ku rejîma hov a Bexda hêrisa xwe ya Kurd qirkirin, bi çekên kîmyawî anî ser Kurdistanê û bi neçarı werlat hate berdan, Sadiqê Emer jî ji zîndana wê hêza Kurdistanê hate azadkirin; ew salek bû ku di zîndanê de bû.

Edî nizanîm rojnama Welat hêjî belge divên ji bo ku em pitir welatparêzî, şoresgerî û pêşverûtiya(!) vî mirovî ji wan re xuya kin yan jî ev bes in ?

Rast e piştî serhildana buhaba 1991'ê rizgarkirina pişka başûrê werlatê me, Bereyê Kurdistanê tev cas û Kurden xiyanet kiribûn, efü kirin. Lî her kesê ku dîroka gelan xwendibe, qanûnen jiyanê bizane divê baş zanibe ku bîryara herî pîroz û girîng di destê gel bi xwe de ye. Ne ku di destê hêzen siyaset e. Ev bîryara pîroz ne bi tenê ji bo Sadiqê Emer hatiye dayin! Belku ji roja serhildana heya iro gel bîryara xwe li gelek kesen din jî bi cî anî, ên wek wî ku bîryara roja dawiyê hîn jî desten wan bi xwîna zarokên Kurdan sor û rûyên wan jî bi teniya gundê şewitî reş bûn.

## "Eger beranê bisko ba, wê li nav pezê bavo ba"

Riza Polat

Li Kurdistanâ Bakur xurtbûn û pêşketina tevgera Kurd, di nav rewşenbîr û demokratên Tîrkan de ferqiyeta fikir û dîtinan jî derxist holê. Iro welê lê hatiye ku piraniya rewşenbîrê Kurd bi şev û roj pesnê hin rewşenbîr û nivîskarên Tîrkan didin; bîyî ku bizanibin û bibînîn ku bi rastî jî kesen ku ew pesnê wan didin, ne dosten gelê Kurd in. Ew, di bin xêliya dostaniya Kurdan de dixwazin rê li pêşîya internasyonalizebûna tevgera Kurd bigrin.

Mixabin iro gelek rewşenbîrê Kurd, meqeda kesen wek Yalçın Küçük, Doğu Perinçek û Haluk Gerger fîm nakin. Ji bo ci ev kesen ku di nav tevgera demokrat û şoresger a Tîrkan de iflas kirine, hatine, bûne rîberen fikri û siyasi yê Kurdistan.

Eger rewşenbîr û siyasetvanen Kurdan bûyeren ku li dinê, li welat û li mintiqê rû didin baş tahlîl bikin û di wan bûyeren da kî ci gotiye û ci kiriye bînîn bîra xwe û ji bo tevgera Kurd encama jê derxin, wê baş bîbînîn ku kesen wek Yalçın Küçük û D. Perinçek ne dost in; gurên ku ketine postê mîhê ne. Wan ci wextî menfaet û mesleheta gelê Kurd nexwestine.

Y. Küçük û D. Perinçek bi navê dijîtiya emperyalizmê di-xwazin tevgera gelê Kurd bikêsin xeteke welê ku divê Kurd dijayedîya her kesî bikin. Wezîfa iro wan daye ser milê xwe ew e ku ew nehêlin mesela Kurd a adîl û heqane internasyonalize bibe, gelê Kurd pirsa xwe ya insanî bi raya giştî a cîhanê bide qebûlkirin û wek her gelekî din pirsa xwe bi riya diplomatiq bi dînyayê bide nas kirin.

Ji ber vê ye ji gava şexsek, rîexistinê ya jî dewletek behsa pirsa Kurdan bike, Yalçın Küçük û D. Perinçek dest bi lêxistina deholê dikin, dibejin "emperyalizmê dest avêt Kurdistan, ew kirin ya jî ew li dijî miletên mintiqê bi kar tînîn". Ev li dijî emperyalizmê ne yan li dijî Tevgera Kurd in? Ne maqûl e ku yê wek D. Perinçek ku do ji dewleta Tîrkan daxwaz dikirin, digotin bila ordiya çaran li Kurdistanê bê bi cî kirin; cîmkî tehlüka perçebûna Tîrkiyê heye û iro jî rabin, bibin dosten Kurdistan. Her welê Y. Küçük jî di mahkemê de, heyeta mahkemê bi piyontiya Emerikayê itham dike û dibêje: "Yê esas li dijî Kurdistanê serbixwe ye, ez im, lê hûn listika Emerikayê nabînîn, Emerîka dixwaze li mintiqê Kurdistanê serbixwe çêke, ez li dijî vê şer dikim".

Fêmkirina emperyalizmê ji bo van kesan, tenê di mesela Kurdi de xwe dide xuyakirin. Li Iraqê gelê Kurd gihîştibû dereca hebûn û nebûnê. Wan dixwest ku bi edebiyata "antî emperyalizmê" gelê Kurd bi destê Seddam bidin qirkirin. Mirov dikare eskerî bibêje ku bavê vê nîrînê terefek ji dewleta Tîrkan bû û di şexsê Ecevit de hate meşandin. Duhî yê ku li Iraqê li dijî mudaxela Koma Milletan bûn, iro di problema Bosna Hersekê de tereftarê mudaxela Koma Milletan in. Ji bo Y. Küçük û D. Perinçek wexta ku Koma Milletan mudaxela Iraqê bike û rî nede ku Seddam şes mîlyon Kurd qir bike, çima ew dibe mudaxela emperyalizmê, lê çima wexta mudaxeleyi Bosna Hersekê dike, dibe "vatînî û mudaxela insanî"? Ma ferqa di navbera van herdu mudaxelan de ci ye?

Bersîva vê pîrsê jî vekirî ye, Y. Küçük û D. Perinçek baş dîzânîn ku destek û piştîgirtina dînyayê unsûrekî esasî ye û di qellîama gele Kurd de bîdengîya dînyayê roleke mezin lîstîye. Yê wek wan dixwazin pirsa gelê Kurd bibe pirseke Anadoliyî û rî lê bigrin ku ew nebe pirseke navnetewî.

Wexta ez li yê wek Y. Küçük û D. Perinçek dinêrim, gotneke bavê min tê bîra min. Carna heger me behsa yekî bikerî û ew mirov ne kîrhatî ba, wî dê bigota: "Eger beranê bisko ba wê li nav pezê bavo ba". Ez dixwazim gotina bavê xwe dewam bikim û bêjim, eger Y. Küçük û D. Perinçek baş, durist bûna wê ji bona gelê Tîrkan bixebeitîyana û ji xwe re Tevgera Kurd û Kurdistan nekiribana meydana ceribandinê.

## "Şûr û Qelem"

Di roja 12.9.1992'an de Emîr Hesen Pûr ku li Kanadayê mamostatiya Universita Windsor dike, bi însiyatîfa Federasyona Komelîn Kurdistanê li Swêdê, bi navê "Şûr û Qelem: Zimanê Kurdi û Pirsa Desthilata Siyasi" seminerek da. Emîr Hesen Pûr di seminere de bi giştî li ser dîroka nîvîsandina zimanê Kurdi sekînî, qala problemen iro yê zimanê Kurdi kirin.

Emîr Hesen Pûr ji bili vê seminera li Stockholmê, li Uppsala'yê bi eyî babeti seminerek da.

Bi alîkariya Universita Uppsala'yê, Emîr hesen Pûr ji bo Swêdîyan jî bi zimanê Ingilizî li ser zimanê Kurdi seminerek pêşkêş kir. Armanc li ser zimanê Kurdi û problemen di vî warî de bi Emîr Hesen Pûr re peyi. Hevpeyîn wê di hejmarê bê de bê çapkirin.

Rapora Komela Mafê Mirovî ya Diyarbekirê:

# Li ser cînayetên kontr-gerilla

Piştî avakirina hukûmeta "şefaf" ya Demirel û Înonu, li Kurdistanê cinayetên kontr-gerilla pêl pêl fireh bûn. Her roj li Kurdistanê bi destê dewletê cinayetên qatilnediyar(!) çedîbin. Komela Mafê Mirovî ya Diyarbekirê li ser cinayetên dewletê raporek fireh çap kir. Di raporê de navê kesên ku piştî avakirina hukûmeta "şefaf" ya Demirel û Înonu hâline kuşin û qatîlen wan nehatine girtin cî digrin. Di raporê de navê kesên ji 1'ê Çileya Paşin (Ocak) heta roja 10'ê İlona 1992'ya hatine kuşin hene. Em li jêr navê van kesên kuşî bi tarixa roja kuşin hene û ciyêñ ku lê hatine kuşin çap dikin.

Ebubekir Kotan - Diyarbekir 5.1.1992, İbrahim Kızmaz - Nisêbin 6.1.1992, Emine Turan - Nisêbin 6.1.1992, M. Salih Tatlı - Urfa 8.1.1992, Abdulsemet Çetin - Diyarbekir 12.1.1992, Adil Bayik - Nisêbin 13.1.1992, Harbi Arman - Diyarbekir - Erxeni 20.1.1992, Abdurrahman Sögüt - Nisêbin - 20.1.1992, Abdurrahman Ercik - Nisêbin - 23.1.1992, Hüseyin Tayşu - Silopi - 24.1.1992, Ahmet Bayram - Bingöl - 24.1.1992, Nizam Kışın - Mazıdağı - 24.1.1992, Huseyin Pamukçu - Batman - 24.1.1992, İsmet Çelik - Batman - 25.1.1992, Oktay Türkmen - Nisêbin - 2.2.1992, Necim Yarıç - Nisêbin - 6.2.1992, Metin Eleksi - Batman - 10.2.1992, Ahmet Bayhan - Diyarbekir - 15.2.1992, Halit güngen - Diyarbekir - 18.2.1992 (rojnamevan), Cengiz Altun - Batman - 25.2.1992 (rojnamevan), M. Emin Narin - Nisêbin - 27.2.1992, Şeyhmuş Akinci - Farqîn - 27.2.1992, M. Emin Saman - Nisêbin - 12.4.1992, Hamdusena İpekçi, Haci Biçer, Ramazan Yavuzkılıç, Menaf Şimşek, Bayram Güleç, Ercan Karadağ, Nihat Kadınhan, Ahmet Turan, Hanifi Kutlu (ev kesana navbera 26.3 - 13.4.1992an li Farqînê hatin kuşin), Abdo Zeren, Tahir Mat, Mehmet Taşkin, Şerif Bayram (ev kesana di 21.3.1992'an de li Entabê hatin kuşin), Mehmet Geren - Diyarbekir - 23.3.1992, Vahap Asma - Batman - 6.4.1992, Abdulselam Çiçek - Farqîn - 15.4.1992 (3 kes hatin girtin lê çibûn ne diyare), Baha Doğru - Diyarbekir - 23.4.1992, Şeyhmuş Akkurt - Kızıltepe - 24.4.1992, Huseyin Dinler - Kızıltepe - 1.5.1992, İsmail Irmak - Nisêbin - 2.5.1992, M. Emin Akin - Batman - 3.5.1992, Veysi Ağci - Batman - 3.5.1992, Seyithan Tekkur - Diyarbekir - 2.5.1992, Zeki Bulut - Diyarbekir - 5.5.1992, Mehdi Çeçen - Kızıltepe - 5.5.1992, Ahmet Aydin - Nisêbin - 6.5.1992, Ramazan Yıldırım - Kızıltepe - 6.5.1992, M. Siraç Akbay - Kızıltepe - 6.5.1992, Mehmet

Dursun û Mehmet Hüseyin Bakır - Kızıltepe - 12.5.1992, Ahmet Bakrak - Perwarî - 12.5.1992, Sabri Tekin - Batman - 15.4.1992, Nuri Gökçen - Kızıltepe - 18.5.1992, Edip İbrahimoğlu - Kızıltepe - 18.5.1992, Ahmet Turgay - Kızıltepe - 20.5.1992, Mahmut Ertekin û Şeyhmuş Gündüz - Diyarbekir-Siwereg - 21.5.1992, İsmail Sertkaya - Kızıltepe - 24.5.1992, İbrahim Demir - Batman - 24.5.1992, Abdülaziz Songültekin - Wan, Mura-diye - 24.5.1992, Seyfettin Aydin - Kızıltepe - 28.5.1992, Seyfettin Ekmen - Batman - 31.5.1992, Hüseyin Erdogan - Batman - 3.6.1992, Seydo Aydoğan û Abdurrahman Ural - Kızıltepe - 5.6.1992, Hafiz Akdemir - Diyarbekir - 5.6.1992 (rojnamevan), M. Emin Ayhan - Farqîn - 14.6.1992, Şeyhmuş İbrahimoğlu û Hasan İbrahimoğlu - Kızıltepe - 14.6.1992, İsmail Demirhan - Batman - 14.6.1992, Sıddık Tan - Batman - 21.6.1992, Sıddık Yılmaz - Batman - 21.6.1992, Abdullah Aksoy - Diyarbekir - 26.6.1992, Ramazan Yüce - Diyarbekir - 29.6.1992, A. Halil Yavaş, Adil Yavaş û Nasır Yavaş - Farqîn - 30.6.1992, Mustafa Ekinçi - Diyarbekir - 30.6.1992, Hüseyin Uğuş - Batman - 3.7.1992, Mehmet Ergin - Farqîn - 10.7.1992, Faysal Kızılırmak - Ceylanpinar - 10.7.1992, Ali Bozan, Şükrü Yıldız û Mehmet Kartal - İdil - 12.7.1992, Mustafa Türün - Nisêbin - 14.7.1992, Nihat Cilaşun - Kızıltepe - 15.7.1992, Mustafa Saltukapi - Batman - 19.7.1992, Mehmet Taşdelen - Nisêbin - 19.7.1992, Abdurrahman Akbalık û Abdulkerim Aslan - Nisêbin - 22.7.1992, Seyfettin Özdemir - Batman - 23.7.1992, Şeyhmuş Güneyli - Diyarbekir - 24.7.1992, M. Salih Güneyli - Diyarbekir - 25.7.1992, Yakup Yöntem - Kızıltepe - 25.7.1992, Cevdet Taşan, M. Nessim Ormancı û Mahsun Erol - Batman - 25.7.1992, Bedirhan Güneş - Nisêbin - 25.7.1992, Naciye Özer û Nurcan Özatak - nahiya Durankaya - 28.7.1992, Fevzi Akar - Midyat - 28.7.1992, Salih Yıldız - Kızıltepe - 29.7.1992, Abdulkadir Özalp - Bismil - 29.7.1992, Çetin Aba-

bay - Batman - 29.7.1992 (rojnamevan), Sabri Parlak - Diyarbekir - 30.7.1992, Yahya Orhan - Kercos - 31.7.1992 (rojnamevan), Hüseyin Deniz - Ceylanpinar - 9.8.1992, (rojnamevan), Ayten Öztürk - Dêrsim - 10.8.1992, Nazım Demir - Midyat - 16.8.1992, Seyithan Kardeş - Nisêbin - 19.8.1992, Ekrem Gürün - Batman - 24.8.1992, Sait Keskin - Batman - 25.8.1992, Şükrü Keskin - Nisêbin - 27.8.1992, Süleyman Güler - Nisêbin - 27.8.1992, Ali Başak - Batman - 29.8.1992, A. Sıddık Turhallı - Diyarbekir - 29.8.1992, Murat Başaran - Kızıltepe - 3.9.1992, Ahmet Koyun - Nisêbin - 3.9.1992, Reis Adiyaman - Ağrı - 7.9.1992, Emin İnanç - Farqîn - 10.9.1992, Hanefi Poyraz û Fuat Yaşasın - Farqîn - 19.9.1992, Musa Anter - Diyarbekir - 20.9.1992 (niviskar û rojnamevan), Salih Güler - Batman - 19.9.1992, Selahattin Kinis - Batman - 20.9.1992, Dersim Tanış - Farqîn - 21.9.1992, Halil Aslangiray - Batman - 22.9.1992, Edip Kılınç - Batman - 22.9.1992, Eyyüp Ayas - Vêranşar - 22.9.1992, Sami İşik - Batman - 23.9.1992, İbrahim Karaaslan - Diyarbekir - 23.9.1992, İsmet Demirci - Erxeni - 23.9.1992

Têbîni: Navê kesên ku piştî 10'ê İlônê hatine kuşin di raporê de tunene, ev nav me lê zêde kirine. Lista kuşîyan bi xwe kêm e, cunkî heta 23'ê İlônê hejmara kuşîyan gihaştibû 220'an. Heta nuha li Batmanê 76 kes, li Nisêbinê 46 kes, li Farqînê 41 kes, li Diyarbekrê 21 kes, li Qiziltepê 18 kes, li Ruhayê 4 kes, li Herzexê 5 kes û 9 kes jî li derên din hatine kuşin. Heta iro 63 kes jî birîndar bûne.

Li alîyê din di raporê de beşek jî li ser kesên birîndar bûne heye. Wek vî beşê ku em çap dikin, di wir de jî nav, cî û tarîx hatine dayin. Ji ber tûnebûna cî, em nikarin li vir cî bidinê. Di raporê de hejmara kesen birîndar 63 in.

# Weşanênu Nuh

Amadekar: Rohat

**Kevoka Spî**, Fırat Ceweri, 74 rûpel, Weşanxana Beybûn, Enqere, 1992.

Di vê pirtûka serpêhatiyan de heyât serpêhatiyan niviskar cih girtine.

Kevoka Spî, Dilê Şikestî, Şeva Sersalê, Doktor Sertaç, Heyşte Adarê, Stérkek Ji Ezmanê Me Xurici, Xewna Orhanov, Kêzika Bênav. Pirtûkeke Fırat Ceweri ya serpêhatiyan cara pêşin li Stockholmê sala 1986'an bi navê Girtî hatibû weşandin.



**Destpêka Edebiyata Kurdi**, Mehmed Uzun, 108 rûpel, Weşanxana Beybûn, Enqere, 1992.

Niviskar di vê lêkolina xwe de bi kurtî dîroka edebiyata Kurdi pêşkêsi xwendevanan dike. Pêşketina edebiyata Kurdi li ser ci bingehan pêk hatiye? Mehmed Uzun di vê pirtûka xwe ya nûh de dixwaze bersîva vê pirse bide. Tirkiya vê lêkolînê beş-beş çawa tê zanîn di rojnama Özgür Gündem (22.6.1992-2.7.1992) de der çûbû.


**Evîna Cemîlê**, Cengiz Aytmatov, 76 rûpel, Weşanxana Firat, İstenbol, 1992.

Ev cara pêşin e ku pirtûkeke Cengiz Aytmatov bi zimanê Kurdi (zaravê Kurmancî) tê weşandin. Ev çiroka evînê Naci Kutlay wergerandiye Kurdi, ji kijan zimanî wergerandiye? Ev yeka nehatiye diyarkirin. Di rûpelên pêşin de pêşgotineke Louis Aragon ji cih girtiye ku têda li ser afîrandariya Aymatov tê sekînandin.




**Evîn û Jîyan**, Lokman Polat, 80 rûpel, Weşanxana Çanda Nûjen, Stockholm, 1992.

Ev pirtûka Lokman Polat ji 14 serpêhatiyan pêk hatiye, beşêke wan berê di rojname û kovarên Kurdi de hatine weşandin. Çawa niviskar di pêşgotina xwe de dide diyar kirin, beşêke van serpêhatiyan ev cara pêşin e têne weşandin.



**Tîr Di Nîvê Kezebê De**, Zeki Seyda, 87 rûpel, Weşanxana Jîna Nû, Stockholm, 1992.

Di nav rûpelên vê pirtûkê de gelek helbestên niviskar cih girtine, çawa tê xuyan ev pirtûka wi ya pêşin e. Piraniya helbestan li ser rewşa Kurdistanê, têkoşîna gel û giyanê weletparêziye hatine nivîsin. Niviskar armâna vê pirtûka xwe jî bi çend peyvan ve weha şirove dike: "Min xwest evindarî û weletperveriyê bihonim, hesreta dilê xwe bîrijinim ser kaxez. Çiqas bi ser ketim, nizanim. Biryar ye we xwendevanen hêja ye".



## Rapora Komîsyona Ingilîz

Di vê mehê de, parlamente û serokê Koma Mafê Mirovî Lord Avebury û parlamente Michael Feney li ser doza Kurd û kîryâren dewleta Türk raporek amade kir. Ji iddiyâyen ku di raporê de cî girtine hînek ev in:

■ Li gor ifâden gelê herêmê, orduyê bi topên hawan û tanqê Alman li ciyêñ sivil xistiye, leşkeran mal û mulkên xelkê talan kirine, şewitandine, li kesen girtî işkence kirine.

■ Qanûna Esası ya Türk û nade ku piraniya gelê Kurd biryara dahatuya xwe ya siyasi bidin.

■ Piraniya Türk rastiya pirsa Kurdî qebûl nakin, Kurdan teşwiqi têkoşîna çekdar dikin.

■ Di vê rewşê de xelet e ku mirov peyva "teror"ê bi kar bîne.

■ Siyaseta Türkîye ew e ku gelê Başûrêrojhîlat, yêñ ku ser na-kin surgunî derveyî herêmê bike. Divê li ser bûyera 17 kesen ku li Şîrnxê hatine kuşin, mahkemeyeke serbixwe çêbibe.

# KİŞTENA KALIKÊ DR. ŞİVANİ\*

## Mûnzûr ÇEM

... O sire de kî pasayêde newe amo Xarpêt, hetê ma de xelk ci ra vatêne Avdile Usen Pasa, resmîyet de kî namê xo "Abdullah Alpdoğan". Veng vêjîya, qese bî vilâ vake:

-Avdile Pasa nêjdî de êno, çekû eve xo têslîm ceno.....

... Na ra a roza ke çêk teslîm kerd day, Avdile Pasay hen milêt de qesey kerd. Nêtê xo o bî ke fikrê milêt çâ wo, ci tengê oncenê, gerrê xo çinay ser o wo êy bimisone. Eke hen kerd, qese cêra ra ame ve alaqê dewlete û xêlkî ser. A deqa de Civrak ra Bertal Efendiyo Xormeçik kî úza ro. Tavî o mordemêde wendox û zonawox bî. Tirkî kî rindek qesey kerdene. Eke Avdila Pasa wazeno ke ê meselû ser o qesey bikerone, Bertal Efendi dest nano pi ra, qalê feqîren, xiravên û zilmê dewlete keno. Qaymeqam, cendermîy, tahsîldar çu tir milêt rê heqaret kenê, pelexnenê, vano. Eke çu tir beno, tuşkê hen êno, nêjdî de çereno, úza ra çing beno, vilê ê dêy ceno, ano misneno ra pasay, vano ke:

-A ma ra vêrgiyê nêy cêne. Ma bese nêkeme ke binê hesavê nêy ra vêjîme.

Zeke o hen qalê zilmê dewlete keno, vergî ser o vindeno, Avdile Pasa çêfê xo remeno. Ci ra pers keno, vano ke:

-Ma na milêt hen vêkaletê xo do to ke, ti namê dîne ra na qesey kena?

O vano:

-Ya, do mi.

Naye ser o Avdile Pasa hen ze tenê çimonê xo milêt ser a feteleno, juyê Arêyîz ra pers keno, vano:

-To rîyê xo do Bertal? O to temsîl keno?

Arêyîz vano:

-Nê.

A Arêyîz eve o qeyde ra wertê milêt de Bertal Efendi dano meçûpkerdene.

O mordemeko Arêyîz pêye con, iñsatê qislê eskeriya de eve qeza merd.

Uyo ke qal amo ra, ez naye kî vajîne: Rasti kî vêrgî zof bî. Mordemo seqîro ke hen senkek bizê xo bî, êy kî vêrgî dêne. Tavî milêt rê zor amênê, nêdêne. O waxt kî cendirmîy kewtene ra dime, ci rê heqaret kerdene. Ya kî mecbûr bîyêne remêne, naza-haza dizdî ya mendêne. Zovî kî dewlete zof xiravine bîye. Qanûn, nîzam-întizam çinebî. Heq û hûqîqê milêt nêardene çimû ver. Kamecî roze eve ci qeyde, kamecî xiravînen bîyêne, beluye nêbîye.

'a ra zeke çêk amey topkerde, dewlete dest na pi ra naza-haza qereqolî viraşti. Na game kî xof û terso ke zerê milêt der o, kerd zêde. Herkês tersa vake:

-Ma çêk teslîm kerd, dewlete dest no pi ra qereqolû virazena. No senê çiyo niyanen o?

Na bêhuzirêñ û ters roze ve roze bî hîra, bî girs.

Tofanê Serronê  
1937-38 êno

Hîris û hot (1937) ke ame kî

## MÛNZÛR ÇEM



**HOTAY SERRA  
USIFÊ QURZKIZI**

bî, hama têpiya onca kî kesh rî eskera nêbî. Pêyê con tayine vake ke "Celal Bayar amo, şyo".


Pasa a sewe ûza Nazmîya de mend. Bertal Efendîyê Aliyê Gulavî (Bertal Efendîyo Xormeçiko ke mi na ra avê qal kerd) şî lewe, zuvîn de qesey kerd. Roza bîne sodir ke o pasa bî rast tekit şî, pêy de xafela Bertal Efendî ame guretene. Na ra na guretene ser o, Bertal Efendî ve xo kî mileto bîn kî sas kewt ci. Çike wertê Bertal Efendî û dewlete rind o, memurê pîl, pasay tê de êy nas kenê. Juyo zê dêy cu tir êrjîno zerre?

Heto bîn ra kî Bertal Efendî ìhale gurêtîv, hetê Mûxindîye û Mazgîr ra, goligonê eskeriyê rî cew ardêne. Çike esker hetê Nazmîya û Mamekiye de kowû ra bî, bese nêkerdene ke goligonê xo mird kerêne. Bertal Efendî cew ardê, Nazmîya de teslîm eskeriya kerdê, inê kî úza ra rasnêne hurênd. Na ra Bertal Efendî gureto zerre der o, mayîne kî hen tîja amnon ver a, verê çêverê Dayra Cendirmû de dîregâ beyraqe ra girêdayî ya.

A roze eke tîj ko ro şîye bî sonde, ma nîyada ke Derê Kal Mêm de dûmanê vêjîya. Derê Kal Mêm hetê Kemerê Duzgin der o. Reýna ke ê Heyderonê ke serra hîris û hotîne de teslîmê dewlete bîyê, ê tê de ardê pêser, berdê Derê Kal Mêm de qir kerdê. O honde milet, esker ûza qir kerd şî.

Mi citê postal gurêtîv, teng amêne, ez amûne çarşı ke yîne bîvurrnîne. Endî vara son o. Xafela mi nîyada ke Bertal Efendî, Çetîn Beg û Naye Mudiriyê Dêruye hen ospor vêrd ra şî. Çetîn Beg rutba xo çike bîye nêzonen, hama sûbay bî. Ê ke hen se-disêy mêtro şî nêşî, dime tayê kî esker vêjîyay. Ê kî ospor ê, terkû de kî zengen û kûrêg estê. Hen dîne dime sonê. Na ra ez ve çor hevalonê xo ra kî dîne dime rîme. Hevalê minê ke lewê mi de bî, lazê Bava Hemêd Kenan, lazê Bava Dursin Mûsa, Paga Sam ra Usiv, zu kî Mazra Sure ra lazekêde Lobil ma de bî. (Dêy ra lazê Hesê Kot vatêne hama name nîno ra mi vir). Raya ma ju ya. Ma kî some ke şime Xaltû. Na ra eke mordem taye ca şî raye bena di letêy. Raya juye Azgilere ro sona, awa bîne kî Vilê Kêwl ro. Ûza ma wast ke hetê Kewl de Bertal Efendî dime şîme. Çi ke ma merax kerdene ke hala êy kata benê, pi ro se kenê? Fejet cendermû nêverda ma a raye ra şîme, ma mecbûr mêtîmîne raye Azgilere gurete.

Tij kî endî ko ro şîya, hama hama ke mixûrvî dest no pi ra. Ci esto ke hona isû bêlû kî beno. Tavî ma kî şayêne some hama çismê ma dîne ser o wo, qe ranêvurmeme. Pêniye de kî ma nîyada ke veng kewt ra tifong. Zeke veng kewt ra tifong, Bertal Efendi mayîna xo ra gina war o. Ma kila tifong kî ferq kerde. O ke úza hen kist, ma endî nêtorayme şîme Xaltû, úza Azgilere de mêtîmîne. Isonê dewe şî ware, bon bêveng



Dr. Şivan (Sait Kirmizitoprak)

bî. Ferat vanê ma şîme çardaxa dêy, te de vi-nêşîme. Zu o Ferat çê de bî. Cil-mil kî çinebî, ma hen hard de bîme ra derg, kerd so-dir.

Eke bî sodir, ma úştîme ra tekitîme şîme Nazmîya. Têpiya şîme karê xo ser, hama kar çinebî, roniştaye bîme. Tenê mend, laze-ko Lolizo ke ma der o, piyê dêy vêjîya ame. Rêyna ke lazê xo ke nêşîyo çê, merax kerd, sodir rew usto ra amo. Zeke amo Vilê Kêwl, ûza Mêyîtê Bertal Efendî dîyo. Hen lewê raye de wele kinitîv, kêrdîv bîne, hama taye caye xo tever a bî.

Pêyê conî, ver va son Bertê Mamê Usenê Şîx hen hetê ma ser ame, ame lewê ma, verê dêş de çok da ro, vake:

-Usiv!

Mi va:

-Çik o?

Vake:

-Çê Aliyê Gulavî pîl û qiz tê de ardê Remedan de Hîra Gewre de, lewê bononê Dursin Axay de qir kerdê.

Na ra mi ra ci ra nayê vano? Ci ke zozeno ke ma ve çê Aliyê Gulavî ra zuvin nas keme, dostî me. Çê Aliyê Gulavî çê Bertal Efendî yo.

Yanê Bertal Efendî Vilê Kêwl ra kist, çê ra şêşt û ses tenê kî Hîra Gewre de qir kerd. Na ra hîrê mordemê xo hetê Mûxindîye ser şîye ke têpiya cewê goligonê es-kîra b'arêne. Qumendarê Nazmîya, a roze qereqol rî telefon kerd, ê hîrîmêna kî úza Mu-xundiye de guretê kîstê. Dîne ra zu lazê Bertal Efendî, hûrdînayê bîn kî birazayê xo bî.

Têpiya ê rozû xevere amê vake "Kûrêsonê Yêrêsk qir kerdê." Dîne ra iyê ke ez namû zonê: Çê Aliyê Avaş, Çê Silêmanê İvrâyîm, Çê Hesenê Milî yê. Îne kî danê arê, sewê qereqolê dewe de vindarnenê, roza bîne benê úza lewê dewe de Derê Çirr de kîsenê. Çond tenê ûza de kîstî ez tam nêzonen, hama cêni û cûwamêrd û domonû ra tê de pîya, dormê se kês bî.....

\*Nameyê nê nuşti ma pa na.-Armanc

\*\*Ma no nuşte nê kitabî ra neqlkerd: Münzûr Çem, Hotay Serra Usifê Qurzkizi, Weşanen Roja Nû, Stockholm, 1992, s. 69, 70-75, 79, 109-110

## DOXTOR NÎWÛ, KIRDÎ MA WÛ

Dr. Fiylikê QEREBEGAN

Cend serrî ra ver mi sukay Dêyrbek (Diyarbekir) di yew xeste-xane di doxtorey kerdinî. Rûcîk ez ha cay mu'eyenî di nîweşî mu'eyene kenû, yew ixtiyarû pinasek û ceniyyat xwu ümey zerre.

Pıştey (piragirewtey) yîn pıştey hetî Têrkon monaynî (mendinî). Ez ha yîn ra úwniyin, wazenû ki bizonû kûm nîweş û. Ixtiyar kenû ki vacû "Ceniyyat mi nîweş a", lê bewlû yo ki Tirkî nîzûnû. Pey destû û pey awir çimû qal kenû. Mi zûna ki xal nîşîno derd xwu vacû. Mi ti ra va:

-Xalo, eke (eger) ti Tirkî nîzûnî xwu rî Kirdki (Zazakî) nî zî Kirdasî vaci.

Ez úwniyaw ixtiyar xwu d' bi şâ û xwu şash kerd; sekî kî (kê) meşki cen kerda, fekî yay verdûnî, úna pişikay yi nişti. Agyera ceniyyat xwu ra va:

-Doxtor nîwû, Kirdî ma wû, Kirdî ma wû...

## Cinayetên dewletê û wezîfên me...

S. Rêving

Di van rojan de 3 belge ji aliyê Komela Mafêni Mirovi ya Diyarbekirê ve hatin belavkirin. Yek nav bi nav gundênu ku heta niha hatine valakirin, ya duyem nav, cih, û tarîxa kesen ku ji aliyê polis, leşker, tîma taybeti û ceşîn dewletê ve hatine kuştin, ya siyem ji listeya navêne Kurdênu ku di nav vê sala dawî de bûne armanca gulleyen cinayetên "fail meçhul" e.

Li gor belgeya siyem û hin navêne iê zêdeki, ji 1'ê Çileya Paşin a vê salê, heta iro li Batmannê 76, li Nisêbinê 46, li Farqinê 41, li Diyarbekirê 21, li Qiziltepê 18, li Herzexê (Idil) 5, li Ruhayê 4 û li hinek cihêne din 9 kes, yani li ser hev 220 kes ji aliyê "nenasan" ve hatine kuştin.

Eger hejmara Kurdênu ku bi eşkereyi bi destê polis û eskeran hatine kuştin, li van navan zêde bibe, wê bê dîtin ku li Kurdistana bakur qiyimet jiyana mirovan nemaye; kuştin bûye bûyereke rojane û mirov kuştinê êdî ne wek tişteki ne normal, lê perçeyek ji jiyana rojane dihesibîne.

Kaos û tevliheviyek welê li welêt hatiye peydakirin ku kes nizane wê kengî gulleyek ji cihêki bibe seba dawiya jiyana wî.

Raporêni Komela Mafêni Mirovi mesela ku heta iro em li ser çareserkirina wê bê perspektif, dest û pê girêdayî mane, derdixe pêş: Divê li dijî politikaya dewleta Tirk, li hember çeteyen kuştinê; kontr gerilla Hizbulâh, em ci bikin?

Dewlet ji bo ku bi vê tevliheviyê érişen xwe yên li dijî Kurdan, "bi heq" derxe, tev dezgeh û organen xwe xistiyekar; leşker, polis, par-

lamento, wezaret, masmediya, û 'rewşenbirên Tirk" yanî tev aliyen civakê li dijî Kurdan rabûne ser piyan. Di rewşekê weha de bêdeng, bêperspektif, temâşeyî rewşê kirin, bi tenê listeyen kuştıyan dirêjtir dike. Tevi ku Kurdan bi awayê pêwîst bi kar nanîbin ji, ew nikarin çareserkirina vê meselê bispêrin wicdanê edaleta polis û mehkemeyen Tirk.

Divê civaka Kurd bi bikaranina hemû imkanen legal û ilegal bê bi rîk xistin. Partî, rîxistinê demokrat, rojname û imkanen qanûni têkevin kar. Bi riya partî û rîxistinan, divê li her bajarekî Kurdistanê Komeleyen mafêni mirovi, komeleyen "parastina jiyana mirov", komeleyen li dijî "kuştinê" û.h.w. bêne damezirandin. -Di vî warî de HEP dikare serokatiye bike. Lî mixabin heta iro raporek bi tenê ji ya HEP ê, bo nimûne li ser gundê xopankirin, li ser kuştıyan tuneye, heta nuha li ser bûyereke bi tenê ji HEP'ê meclis nexistiye kar. Parlamenten HEP'ê divê têbigihin ku wezifa wan ne bi tenê grewen birçibûne ye.-


Di salen 1980'yan de tevgera piştigirya girtiyen siyasi pê da, mirovên girtiyan ji bo piştigiriyê xwe bi rîk xistin, grew kirin û di warê parastina mafêni girtiyan de roleke giring listin.

Divê em civata xwe bi tevayî li dijî teror û kuştinê bi rîk xin. Partiyeen me yêne illegal, rîxistinê me yêne legal; aliyen ku bi navê parastina gelê Kurd ketine rî, divê ji bo peydakirina çareyan li rian bigerin.

Mafê jiyânê, matê herî piroz e. Nabe ku em li hember pêlikirina vî mafî bêçare bimînin.

## Xaçepirs

Amadekar: S. Rêving



**ÇEPEKAST:** 1-a- Ke-sê pere û malê wî pir, zengin. b- Bi soranî 'av'. 2-a- Navê pêxemberê filehan b- Xopanî 3-a- Ne, nexêr. b- Navê meha rojyan 4-a- Ard, genîmê hêrayî. b- Pêşangehêne mezin (berevajî) b- Di alfabeja Kurdî de herfa duyem û ya bîst û yekem. 5-a- Li Behdinan û Colemêrgê ji "çem" an re dibêjin. b- Zevî, cihê çandîn lê dibe (berevajî) 6-a- Li ser sînorê Kurdistan û Ermenistanê çemek b- Cihê ku gundi kayê lê muhafaza dikin. 7-a- Gazîkirina navê 'Salih' 8-a- Kin, ne dirêj. b- Rengê c- Qayîm, saxlem 9-a- Birekek b- Vexwari-neke serekî. 10-a- Rih. b- Kesê ku ji welatê xwe

derbider bûyi, müşext. 11-a) Pez, kewal, navê giştî yê mih, bîzin, beran, nêrî. û.h.w. (berevajî). b- Teyrek. c- Di kurmancî de pronavek. 12-a- Aleta ku mirov pê tiştan dibire. b- Di kurmancî de peyveke pevgirêdanê c-365 roj.

## Bersîva hejmara berê

**Çepekast:** 1-a) Şîrnex, b)azadi. 2- a)al, b)elok, c)olan. 3- sixur. 4-a) İskan, b) Hewlêr. 5-a) Bexdad, b)ze. 6-a)di, b)tevrî. 7-a)oli, b)serad, c)ba. 8-a)sê, b)reş, c)neban. 9-a)okeb, b) Kawa. 10-a)it, b)cem. 11-a)aligir, b)aw, c)ra. 12-a)narîn, b)eni. **Serejêr:** 1-a) Shahî, b) Kosova. 2-a)il, b)sb, c)lek. 3-a)kedi, b) evîn. 4-a)nesaxî, b)rb, c)ga. 5-a)elind, b)se, c)vir. 6-a)xox, b)ateş, c)rî. 7-a)kuh, b)er, c)si. 8-a)rezvan, b)ta. 9-a)zo, b)werdek, c)we. 10-a)alal, b)bac. 11-a)da, b)el, c)bawerî. 12-a)nor, b)Panama.

## Dûmahîka nûçeyan

### Musa Anter hat kuştin

Jiyanekê Musa Anter ya serbilnd û bi reng heye. Wî di bîranîn xwe de nivîsandiye ku ew sala 1917 yan ji 1918'an li gundê Zivingê ku girêdayî Nisêbinê ye, hatiye dinê. Lîse li Adenê, univeristyeyâ huquqê ji li Setnbolê xwendîye. M. Anter hemû jiyana xwe bi welatparêziye derbas kir. Wek ronakbirekî Kurd geleme xwe li dijî zordarî û ne-heqîya dewleta Tirk bi kar anî. Ji bo wê ji gelek caran kete hebsê û hate surgûnkirin. Bûyera 49'an ku di diroka Kurdistanê de ciyekî girîng distîne; yek ji ji wan ew bû. Di vê bûyêr de ew du sal û nîvan di hebsê de ma û 6 mehan ji surgûnî Çanakkaleyê bû.

Ew mesûlê du kovar ku di salen 1950'î de li Stenbolê derketin, bû. Ji wan kovaran yek Dicle Kaynağı(1948), ya din ji Şark Mecmuası(1950) bû. Ji salen 60'î heta 70'î de gelek kovaran de nivîsand. Kovarîn ku wî tê de nivîs nivîsandin ev in: İleri Yurt, di sala 1958'an de li Diyarbekirê derket. Di vê kovarê de şîfra wî ya meşhûr 'Qimil' ji hatîbû çapkirin. Dicle-Firat di 1962'an de, Deng ji di sala 1963'an de li Stenbolê derketin. Doğu û Deng ê Sêwregê di sala 1969'an de li Stenbolê derketin.

Di 12'ê Adara 1971'ê de ew ji di dawa DDKO'de hat girtin û 33 mehan di hefsa Diyarbekirê de girtî ma. Ü bi efuya 1974'an ji hebsê derket. Sala 1979'an û pişti cûntaya 12'ê Îlonê dîsa hat girtin. Di sala 1989'an de ji ji ber ku di panelekê de li ser pirsa Kurdî peyivîbû li Diyarbekirê hat girtin.

Ji bilî gelek meqale û nivîsen wî yê ku di kovarîn cûrbecûr de derketine; pirtûkîn wî yê ku heta nuha hatine weşandin ev in; Birîna Reş, Ferhenga Kurdî-Tirkî, Hatiralarim û Vakayiname. (Ev pirtûk ji nivîsen wî yê di navbera salen 1987 û 1991'ê pêk tê.)

### Ji berpirsiyare rojnama Welat re

Me bi dilşewatî û bi xemgîniyeke mezin xebera şehîdbûna Kurdperwerê dilsoz, nivîskarê Kurd yê mezin yê rojnama we, Apê Mûsa Anter, bihist. Şehîdbûna Apê Mûsa ne ji bo rojnama we tenê, ji bo hemû gelê Kurd wendabûnek gelek mezin e. Di vê roja reş de tişte teseliyê dide me xebat û mîrata wî ya li pey xwe ji me re hîştiye. Baweriya me xurt e ku wê qelema Apê Mûsa li erdê nemîne; xebat, tekoşîn, ezim û fedekariya wî wê ji me re bibe rîber. Em ji we re û ji malbata wî re sebir û metanetê dixwazin.

Bila serê gelê Kurd sax be.

23.09.1992

Redaksiyona Armancê

### Dr. Sadiq Şerefkendî

kirin. Sala 1972'an ji bo doktora bike, cû Fransayê. Pişti çar salan bi serfirazî teza xwe ya doktorayê li ser kimyaya analitik da. Pişti vegera xwe li Universita Tehranê bû mamostayê kimyayê.

Jiyana wî ya siyasi di nav refen PDK-î de, sala 1973'an dema ku li Parisê xwendevan

bû, dest pê kir. Û her di wê demê de Dr. Qasimlo nas kir. Vê demê tekiliyê di navbera rîxistinê welat û Qasimlo de meşandin. Zanebûn û jîrbûna wi bû sedem ku di nav hiyerarşıya partiyê de zû bilind bibe.

Sala 1979'an, di kongra IV'em de bû endamê Komita Merkezi û berpirsiyare Komita

Partiyê ya Tehranê. Di sala 1980'î de vege-riya Kurdistanê û bû endamê Buroya Politik. Di 1986'an de bû berpirsiyare duwem yê PDK-î (alîkarê Sekretérê Giştî). Pişti qetilkirina Dr. Qasimlo bû Sekreterê Giştî yê partiyê û heta şehîd ket her ev kar didomand.

### Rejîma İslâmî dîsa...

#### Xemgîni û protesto

Şehîdbûna Dr. Sadiq Şerefkendî û sê hevalen wî di nav hemû Kurdan de bû sedemê xemgîniyeke mezin. Berpirsiyaren dewletan, siyasetmedar û maşparêzen mirovi qetilkirina 4 berpirsiyaren Kurdan protestokirin. Gelê Kurd li gelek bajarek Ewrûpayê bi meş û mitîngan ev bûyera terorîstî bi tundî protesto kir.

Komita Merkezi ya PDK-î roja pişti bûyere civiya û beyanek belav kir. Di beyanê de weha tê gotin:

"Her çiqas di vê seeta

ku em vê beyanê belav dîkin de, ji alî polisê Alman ve tu malûmatek di derheqê qesasan de bi dest neketibe ji, em ji hemû kesen ku ji rastiyê natîrsin re eşkere dîkin ku ev qetîlama bêbext bi destê Komara İslâmî ya Iranê hatiye kirin"

Celal Talabanî û Mesûd Barzanî ji li ser şehîdbûna Dr. Sadiq cihê cihê mesaj şandin. Celal Talabanî di mesaja xwe de wek mesûlê vê cinayetê Iran dest nîşan kir.

Komita Merkezi ya PDK-î di civîna xwe ya pişti bûyere de heta plenuma Komita Merkezi, bi muweqetî, Mus-

tefa Hecri ji bo Sekreteriye Giştî hilbijart. Mustefa Hecri endamê buroya politik û alîkarê Dr. Şerefkendî bû.

Cenazê Dr. Sadiq û her du hevalen wî roja 28'ê Îlonê li Parisê veşartin. Cenaze pêşî anîn Enstituya Kurd û du re ji birin goristana ku gorra Dr. Qasimlo lê ye. Li dor 10 hezar kes bi cenaze re meşîya. Li ser navê hukumeta Fransayê Wezîrê Karû Barê insanî Bernard Kouchner di rakirina cenaze de besdar bû. Li ser navê PDK-î Mamoste Abdüllah axaftinek kir.

Mîrza Bextiyar

## Nivîsêñ Rojane

Lewend Firat

Ji me Kurdan kêm kes hene ku rojanêñ xwe digrin û bîranînêñ xwe dinivîsinin. Berî du salan Musa Anter û berî salekê ji Mehdi Zana bîranînêñ xwe wek kitêb çap kiribûn û di van bîranîn de xwendevan gelek tiş fêr bûbûn.

Çendekî berê bi navê "Kale-mimden Sayfalar" (Rûpelên ji Qelama Min) rojanêñ Necmettin Büyükkaya wek kitêb derket. Kitêb ji alî birayê wî Şerwan Büyükkaya ve hatiye amedekirin û Weşanxana APEC tryck çap kiriye. Ew ji namêñ, rojanêñ, nivîsêñ û Ferhenga Zazakî-Tirkî yên Necmettin Büyükkaya pêk tê. Kitêb bi rism e û zêdeyî 500 rûpelî ye. Di dawiya kitêbê de nivîs û meqalîn ku li ser Necmettin Büyükkaya hatine nivîsandin, cî digre. Bi Tirkî Kurdi (Kurmancî, Dimîlî) ye.

Di pirtûkê de Neco ji salên 1970'ê heta 1980'ê rojanêñ xwe nivîsandine.

Herweha ew di rojanêñ xwe de li ser xebata şoreşgerî ya Dr. Şivan û kampêñ wî yêñ eskerî yên li Kurdistana Başûr, kuştina Dr. Şivan û Sait Elçi, kuştina Eli Askerî û hevalêñ wî, li ser PDK-T û têkiliyêñ partiye bi rêxistin û partiyeñ pêşverû û komunîst yên Rojhilata Navîn re, veqetandina wî ya ji PDK-T'ê û sebebêñ veqetandinê, têkiliyêñ wî bi

YNK re, dîtinêñ wî yêñ siyasî li ser rewşa Kurdistanê, civinêñ wî yêñ bi Yekiti, PKK û Ala Rizgarî re, rexneyêñ wî yêñ li PDK-T û KIP'ê û gelek tiştêñ din disekine ku meriv bi heyecan dixwîne.


Dibe ku nivîsêñ Neco li ser hinek meselan ne objektif bin, lê li gor dîtinêñ xwe hin mesela ronî dike, yan jî ji bo ronîkirin rê vedike. İcar kesen ku xwe muxataben hin nivîsan dibînin, dikarin besdarî vê munaqesê bibin.

Nivîsêñ rojane nivîsandin ne karê her kesi ye. Ezim û disiplin divê. Hevaleki digot ku wexta Neco li Swêdê bû, qelem û kaxet ji bêrika wî kêm nedibû û wexta gotinek nuh bi zarava Dimîlî ji yekî bibîhîsta, hema qelem û kaxeta xwe derdixist û dinivîsandin. Û evaran jî wexta diçû malê rojanêñ xwe dinivîsi.

Rojane girtin yan jî bîranîn nivîsandin lazim e bibe karê her Kurdekî siyasî, Kurdekî ku bi hu-nner mijûl dibe yan jî Kurdekî dixwaze civata Kurdish bigehurîne. Ji ber ku nivîsêñ bi vî babetî dibe parçekî piçûk yê dîrokê û neslînuh ji wan feyde dibîne, tercûbe digre û ufqê wan vedike.

Bi taybesî ew kêsên ku bi dehan sal di nav tevgera milî ya Kurd de cih stendine û li gor civate xwe bûne kadir gelo iro çend kes ji wan rojanêñ xwe dinivîsin?

### Yılmaz Guney(1937-1984)




**Di 8  
saliya  
mirina  
Kurdper-  
werê  
mezin  
Yılmaz  
Guney de  
em wî bi  
hezkiri-  
neke kûr  
û bi  
hurme-  
teke  
mezin bi  
bir tînin.**

Armanc

**Te ji bo  
serxwebûn  
û  
azadiya  
Kurdistanê canê  
vwe fedâ kir. Di  
9'emin  
salvegera  
şehîdbûna te de,  
em te û şehîdîn  
din yên  
Kurdistanê  
bi giramî bi bîr  
tînin.**

Hevalêñ te



**M. Nuri Madak(AZAD)  
(1954- 16. 09.1983)**

# BEROS



Mahmûd Lewendî

### Kurteromanek

## qisê qor!

Nivîskarê wê: Ez

Çend roj berê ez li qahweyekê rûniştibûm. Garsonêqahweyê hat ba min û got:

-Çi dixwazi?

Min got:

-Qahweyekê ji kerema xwe re.

Garson qahweya min anî danî ber min. Wekî her gav min pêşî cixareyek derxist û vêxist. Di pê re min şekir avêt qahwe, dawiyê min bi kevçî hêdî hêdî li hev xist. Şekir û qahwe baş li hev geryan.

Min hilmek din jî ji cixara xwe kişand. Lê ev hilma ne wek hilma her wextî bû. Hilmeke welê bû ku dûman heta binê pişik (ciger) a min a sıpi çû, li jîr zemîn-i cîgera min ket û têde fetîlî. Di hemûyê fetlanokên cîgera min de gerya û rûyê xwe da ber bi jorê, hat nêzîkî qirikê, di wir re jî di bin zimanê büçük re hat nava devê min, li ezmanê devê min ket. Di nav devê min de hinekî gerya. Li qulikekê, li riyekî digerya ku çawa bike derkeve der. Xwe nêzî diranan kir, di ber diranan re xwe şemitand hat ket nabêna diran û lêvan, li wê derê jî xwe hinekî gevizand û di pê re xwe li bin çengê pidîyan xist û di nava herdu lêvan re derket der...!

Belê, a wê gavê diviya ku qultek qahwe bihata vexwarin.

### Kurrê Kerê

Kur ji bavê xwe re dibêje:

Bava ez kurrê kî me?

Kurrê min.

-Bas e qîma diya min her roj ji min re dibêje

kurrê kerê?



**Bi te re deng nakim!**

Du heval bi hev re qise dikin, yek ji ê din re dibêje:

-Bi serê te ta'ma jîyanê nemaye, ezê xwe bikujim! Yê din:

-Bi xwedê eger tu xwe bikiji, êdi ez qet bi te re deng nakim!

Wele hema min hêdîka destê xwe yê rastê dirêji qulpa fîncana qahwê kir. Min hêdî hêdî fîncana qahwê rakir berbi devê xwe bir. Lîv wek erdekî ku qet gîsin lênek- etibe û li hêviyê be, ji ber xwe ve ji hev vebûn. Ü fîncana qahwê pêre pêre xwe nézî lêvan dikir. Devê fîncana qahwê devê xwe danî ser lêva jêrin, lêva jêrin di wê gavê de wekî ku ji nû ve biafire vejiyâ...!

Ü di nava dev de tevgerek, diran ji alîkî de, ji alîkî de ziman, pidî, ezmanê dev û zimanê büçük, hemû bi xwe vehesyan. Di hemûyan de tevgerek, lebatek, te digo qey hemû ji do de li hêviyê bûn.

Ü gava ku fîncana qahwê hat ser lêvan, qahweya di hundurê fîncanê de êdî ber xwe nedî, wek korekî ku di çalekê werbe, hema xwe di ser lêva jêrin re xuşikand hundur. Lîv ji zewqa xwexuşikandina qahwê ji xwe ve çûbû, mest bûbû. Tema-mê lebatêñ di dêv de ji nû ve vejîyabûn. Lê qahwe li wê derê pir nesekeñî, hêdîka xwe li bin çengê zimanê büçük xist û di wir re xwe berra qirikê da. Qirika ziwa ji do de li hêviyê bû, lê qahwe nedisekinî, di wir re icar xwe bera hûr da û di hûr de gerya, gerya, gerya heta ku mest bû, di quncikekî hûr de pal da...!

Ü wele hema min destê xwe dirêji xwelidankê kir, cixara xwe girt û min hilmek din jî kişand.

### Naven Kurdi

Ev serê demekê ye ku xwendevanêñ me yên ku li bendî zarokan e ji me daxwaz dîkin daku em ji bo zarokêñ wan ên ku li rê ne navê Kurdi bibînîn. Va ye li jêrê em listeyekê navê Kurdi yên esli pêşkêsi we xwendevanêñ ku li hêviyâ zarokan e dîkin. De hûn ji bê tirs li zarokêñ xwe kin, bila li wan pîroz be!

Agîrbizot	Devjiheve	Herlibende	Pirxur
Agîrpêket	Devlihewa	Herlibendê	Piştlerdê
Ardmalêketo	Devşorbe	Hûrgir	Piştixûz
Baberda	Diranpij	Karo	Porgijgij
Belqityê	Diranqij	Keftar	Pozqertel
Belqityo	Doxinsist	Kefteleft	Pozxwar
Berxiyar	Erdéketo	Kêmxur	Qurqurbeg
Bêderpê	Erdémawo	Kerto	Rûqermiçî
Bêlome	Firnik	Kojo	Rûşuştî
Bindamayê	Fitefit	Kormişk	Sitilqûn
Bintûmaxa	Gonco	Kûto	Têdamayê
Biserneketo	Guhbel	Kurot	Xûzo
Cilo	Guhdirêj	Libendeyê	Xwaro
Çavbeqo	Gumegurn	Limalmayê	Zikgir
Çavlîderê	Guregup	Mellêbuharê	Ziklisér
Çavnûtik	Gurmin	Nigçoqale	Zimandirej
Ciryâ	Gurpegurp	Parsuxwar	Zimankurt
Çogdiberde	Gurxwaro	Pêdirêj	Zûxur
Destçoqal	Herhazır	Pirtenik	

## ne karê aqila ye lê rast e

**Amadekar: Hesen Mizgin**

Hisen mirovi bi ixtiyari qels dibin. Sebeba vê yekê wendabûna hucreyên sinir in.

Damarên xwinê li her ciyêñ laşê mirov hene, tenê ji bili ciyekî. Ew ji emalaya dirana ye. Ji ber vê yekê ye ku dema emalaya diranan xira dibe wek birînêñ din ên laşê mirov baş nabin û pişti demekî diranê mirov ber bi mirinê diçê.

Çavê mirov ronahiyê ji texmînan zûtir fam dike. Çav fotoxrafekî di 0,000 00000002 saniyê de diuguhezine sînalîn elektrikê ku mejî dikane qeyd bike.

Hebên gerêşê li dij gelek nexweşîyan bi kêr tê. Asida asetulsalicul ku di hebên gerêşê de heye riska hin nexweşîyan kêm dike.

Di beşa zimanê Hindi de 140 zimanen esasî û 845 diyalekt hene.

Berbereki İngilizi ji bajarê Yorkshire li Britanya Mezin plastikek nû icad kiriye. Ev plastika nû hewqas zexm e ku di germiya bomba atomî ji nahele. Ev plastika nû wê endüstriya leşkerî û ya komînikasyonê ya Britanya Mezin pêşde bibe. Plastika nû wê teyare û keştiyan li dij germiya bomba atomî bispere.

Yekî Amerikanî ji bo firça dirana patent stend. Tişte ku entresan ji bo vê firça dirana ew e ku dema mirov diranen xwe firça dike ji mirov re müzikê lê dixe.